KURDAX
Malperek Kurdistani ye

Di Stran-3 de metnên van stran û dûrikan hene:
[Farisê Dodo, Fatimê, Fermana mala Brahîm Paşa, Ferza Çolo, Hacî Mamo, Hecî Mûsa Begî, Hefsedê, Helîmcanê, Heme Teyar, Henîfe, Heso rebeno!, Heynayê, Henne û Medo, Hiso, gewram (Gewra minê, Gewrê Gênco, Gidyano, Gulê(1), Gulê(2), Gulê(3), Gulê(4), Kalo rebeno!, Kanî, Kejê(1), Kejê(2), Kevanjenê, Kezîzer(1), Kezîzer(2), Kirîvê, Koçer Doskî, Kotiko, Law Osmane, Lorî, Mala me ji malan wê de, Mamo, Mam delalê, Mamo Pismamo, Memir, Mero, Mêremê, Mihemedê Henne, Mîrê Kurda, Mîro, Mûsa xaîn, M' xewna te dî.]

Ji stranên

Tor Abdîn

Civandin, derxistin û wergerandin bo Almanî: **EUGEN PRYM** û **ALBERT SOCIN**-St. Pétersbourg, 1887
[Tîpguhastin: **Cankurd**]

Farisê Dodo

Carik ji cara, car zemana, (1)

Farisê Dodo, Dalo eslana.

Rikêba hiltînin bi darê rumana,

Dikevin trat û meydana,

Gurza hiltînin li ser milana.

Ji mala Farisê Dodo bîst û du xortana.

Li dor qesra Birahîm axa şerkî girana.

Ji mala Birahîm axa heşt birana.

Serê xwe li hev dixin ferh û berana,

Heçî xatûna çavbelek bikşênê bi darê zorana,

Wê bidin (bibin) ji Farisê Dodo ra, ya (Faris)ê Dalo eslana.

Biran (bira) nadin xûşkê wana,

Herro li wê derê şer girana,

Şerrik li dor qesrê girana,

Li hev dixin bi rum û gurzana,

Didu ji mala Faris axa kuştiye.

Yek ji mala Îbrahîm axa birîndare,

Li lingêd hespa nema tu nale...

Dilê min dadiye,

Mala Faris axa hijûm kiriye...

Xatûnê çavbelek ji qesrê kişandiye,

Faris axa xatûnê çavbelek biriye.

Hêvarê Birahîm axa ji gunda hatiye,

Di dûv mala Farisê Dodo ketiye.

Birahîm axa xwe bi wa gihaştiye,

Şer bû kifristaniye.

Birahîm axa tiştik bi mala Farisê Dodo nekiriye,

Korî poşman (wek: porî poşman) vegeriye,

Lê didu ji mala Faris axa kuştiye,

Bira yê wî birîndar bû miriye,

Birahîm axa rabû piye,

Şergeh û kemîne kiriye,

û e’sker civandiye.

Bi baskê mala Faris axa çûye,

Şer ters û talan hiştiye,

Ters û talan aniye,

Çar qîz û du kur bi xwe raaniye, li mal daniye.

Hêvarê mala Faris axa bi derketiye,

Dûv wa da ajotiye,

Şer li dora gunda kiriye.

Faris axa Dalo eslana, î hatiye,

Awê Faris axa hatiye,

Şer li dor gunda kiriye,

Çar gund batmîş kiriye,

Agir di nav da berdayiye.

Didu ji bira yê Birahîm axa kuştiye,

Yesîrê xwe aniye,

Birahîm axa yesîr girtiye,

Heta mal şenq kiriye.

Ji nu va xatûna çavbelek li xwe mehir kiriye.

Faris axa go me didu kuştiye û me didu dayiye....

---

1. Tîpa (a) li dawiya rêzikên vê parçeyê wek lêvkirina xelkê Cizîrê tê lêvkirin.

Fatimê

Erê Lê Fatimê lê,
Xatûnê xanimê lê,
Yasitar li vê bêbavê lê,
Keçê mi te navê lê.

Erê lê Fatimê lê,
Fesalê bi kesimê lê,
Xeşîmê hakimê lê,
Yasitar li vê bêbavê lê,
Keçê min te navê lê.

Îşev êvara înê,
Mele dixwîne Yasînê,
Fatimê kar û barê xwe kir,
Kil û mirêka tînê.

Çavê reş e kil didê,
Berê xwe da Mêrdînê,
Hêdî, hêdî xwe dihejînê,
Ba ber biska dixînê.

Kilê çava diweşînê,
Dilê xorta d'êşînê,
Erê lê Fatimê lê,
Xatûnê xanimê lê.

Gava Fatim meşiya,
Çaarî bi dû de kişiya,
Kil ji çava weşiya,
Dilê xorta êşiya,
Kul ket mala efendiya,

Erê lê Fatimê lê,
Xatûnê xanimê lê.

Fermana mala Brahîm Paşa

sala 1919
Ebdilhadî Mihemed

Wezîro! bajo li vê fermanê,
Ev fermana wek fermana cara hanê,
Ferman rabû ji cumhûriyetê, ji Selanîkê,
ji Anqerayê, ji meb'ûsanê,
Sibe şerek çê bû li Tel-Henê, li Etşanê,
Şahidê Mehmûd Begê Zerî, exû Nûra, Ebû Ezza,
Gelek hene li Tel-Henê, heta li Wêranşarê,
Bi şûra girtin, xar berdanê belûka Hemdîn Begê,
Hêsîr kirin Ajat xanê....
Kunya Ramê, sera mezin şixat girtin ar berdanê,
Kesek tune li şerê kurê Brahîm Paşa rab temayê rab seyranê,
Pêşiya duxana ewraqê, mehkûma xwe da Tel-Henê, da Etşanê,
Gelek xelas kirin ji bêşê û ji qançarê, ji salyanê,
Bego! Sibe bû, şerek çê bû li Etşana xopan,
Li diyara ji nîro b' şûn da li Wêranşarê,
Tê dengê topa leqî-leqa,
Şerap-nara şehîdê Mehmûd Zerî gelek hene,
Eqal xwar kir da ber siwara.
Ji Tel-Henê heta b' Wêranşarê ajot nav qumandara,
Belûka Hemdîn Begê hêsîr kirin, pişta wan da dîwara,
Mehmûd Beg ban kir: Evdirehman, keko!
Ev ferman ji berê da fermana bav û kala,
Wexta di gaziya me were Temir Beg siwarê Hedla,
Bavê xunêsa, gurê Siwara,
Hêsîrê me hustu xwarin li ber dîwara, birîndar e.
Elo Dado exû Rîma, gurê siwara,
Li Dialya xopan li beyara,
Li Kerkûkê li va xubara pêşiya.
Ramê xwe da Nebî Eyûb eleyhisselam, tev zabita qumandara,
Dawî ma li kêşê û li mizarê,
Li gundê Evdilqadir Rahil-elya, tev teresê wan neyara,
Bego! Bajo, melezîne,
Ya xweş bajo meleqîne,
Xensê ban kir: Mehmûdo! Lawo! şev dirêj e, qiyamet dûr e,
Nefîr a'mê bi hev gihîne,

Dizgîna mitêra li dest bigerîne,
Guçê şal qedîfa li milê xwe werîne,
Ji nîro b’ şûn da evdurehman bavê Haçim,
Biçûkê bira gelek hene, li kêleka rastê Xerzanî ne,
Serê Xerzaniya lî û yaban doz lê gerandîne,
Xensê ban kir: Mehmûdo! Lawo!
Bazde xwe b’ rêka Wêranşarê şewitî gihîne,
Lêxê serê topçî û borîzana bifirîne,
Topa mezin, cûra devreş jê bistîne,
Heyfa milk û meaşê Brahîm Paşa jê hilîne,
Lêxê navê bav û kalê xwe bi derxîne,
Êşîr şîrîn me terkîne,
Ram (Rom: Tirk) xaîne, me dixapîne,
Mala we ji berê da ji dewletê fermanlî ne,
Xensê ban kir Mehmûdo! Lawo!
Wexta Xelîl Beg siwarê firêca Ebû Subhî, xwe bi xwe gihîne,
Li Edwan û ehlê Ebrê biqîrîne,
Bazde xwe bi rêka Nebê Eyûb eleyhisselam,
Xwe bi derbendê asê gihîne,
Tomatîqa axir makîna li ber reqîne,
Topa mezin cûra devreş pê gumîne.

Wezîro! Lêxê, pêşî li Nebî Eyûb,
Dawî li kêşê û li mizarê vegerîne,
Bi destê her çend peyên mala Lihê bigrin bi xwe gihînin,
Birîna Elo Dodo, kekê Rîmê, gurê siwara hûn me êşînin,
Wêranşara şewitî bi hûrkanî ne,
Xensê ban kir; Mehmûdo! Lawa!
Hêlkê li burcê, belek qesr û baxê me sipîne,
Kaxedek ji Begê mi ra ji Anqerê, ji meb’ûsanê reş anîne,
Mi gelkî kêf kir, mi go: Belkî efwa Begê mi anîne,
Mi bi xwendin da, got Mehmûd Beg û Xelîl Beg û Smaîl Beg,
û Evdurehman Beg û Temir Beg,
her pênc bira ji dewletê fermanlîne.
Enabî bişewite, wa bi dar e,
Başka û Hecê Zêd bi ser da mêl û xwar e,
Eskerê Hemdîn Begê li Hecî Zêdê yek hezar e,
Elaya Husên Paşa li Etşanê du hezar e, şad û şûd e.
Evdurehman bavê Haçim gelek hene,
Li Etşanê, li ber Romê bû zinar e, bû parçak polat e,
Hat xwar e, Xensê ban kir Mehmûdo! Lawo!,
Elo Dodo, exû Rîma, gurê Siwara birîndar e,
Li Hecî Zêdê, li her du aşa wezîro!,
Li hevde malê li ber du aşa.

Sibe bû şerekî mezin çê bû li Etşana xopan,
Li Enabiyê, li berê kaşa,
Ji nîro bi şûn da, li Wêranşarê tê dengê topa, liqiliqa bêş ataşa,
Kesek tune li Hecî Zêda şewitî rab seyrana koma laşa,
Ji nîro b' şûn da reş bû bextê Hemdîn Begê û her du qeraşa,
Hemdîn Beg sê denga ban kir, go: her bijî Mehmûd Paşa,
Temir Beg Ban kir, go:
Hûn zanin ji berê da ev fermana mala Temir paşa...
Wezîro! Bajo, li vê fermanê, hêdî bajo, hûn fermanlî ne,
Sibe bû, bira li me ne, heta roja vê bazarê,
Xensê ban kir: Mehmûdo! Lawo! Mêze Romî pir e,
Pêşiya zabita xwe da Nebî Eyûb eleyhisselam,
pêşiya qumandara,
Xwe da girê Wêranşarê, hêlkê xwe da welatê Çwîva, wê Hesarê,
Romî pir e, rava jorîn xwe da Qerej-daxa şewitî, wê Necarê,
û hêlkê xwe da her du kurê deve qirana, wê minarê,
Rava jorîn xwe da welatê Tirka qijî darê,
Ordiya xalid Begê ma li Swêrekê, li Heywanetê li Çîm Hesarê,
û rava jêrîn xwe da welatê şêxa, şêx û şarê,
û pêşiyê xwe da Nebî Eyûb eleyhisselam,
dawî ma li gundê Qedûrê lawê Dire'ê,
li Kêşa şewitî, li wê mizarê...
Bejna evdurehman, bavê Haçim, apê Redda xweş e, bi rextê enextarê,
Şahidê Mehmûd Begê Zerî,
Sê tabûr eskerê romî li Wêranşara şewitî xist hesarê.
Wezîro! Ev êvar bû, ro tune,
Ma sî kulupî (qulibî) ser kelema,
Xensê ban kir: Mehmûdo! Lawo!
Mila xaîn, tu tê nema eşîr xaîn,
tu tê nema gazî dûr e, îmdad nema,
Wexta digaziya we were, çend peyê Çiwîva,
Şêst û du peyê Dodkan teyê ye, şêxê Berha,
kekê Qudretê, siwarê sorbozê, exû Sema,
Wezîro!....
Mi ji Tel-Henê heta bi Wêranşarê,
Pozê serê Hey'et geriya li Mehfelê,
Civat geriya li Mehfelê.
Xensê ban kir: Mehmûdo! Lawo!,
Pêşiya qumandara xwe da girê Wêranşarê,
Û quweta mezin xwe da aşê Elo Dîna, Til-Bênderê,
Xema me xwe, ev ferman weka fermana cara berê.
Wezîro! Wêranşara şewitî bi kevir e,
Û hevde mala şewitî bi hûrkevir e,
Şahidê Evdurehman Beg bavê Haçim apê Radda gelek hene,

Ji Til-Henê, heta bi Wêranşarê, hucûmî topa mezin kir e,
Barûda topê li ser serê bavê Haçim bû komir e.
Wezîro! Ew sibe ye, xweş sibe ye,
Xensê ban kir: Mehmûdo! Lawo!....
Topa ewilî teqiya, ji Heçî Zêdê, ji gundê we ye,
Kaxidek ji Begê mi ra hatiye ji Anqerayê,
Ji meclîsê ji bo birîna serê we ye,
Wêranşarê meterkîne, ji berê da mulk û meaşê bavê we ye.
Xensê ban kir: MehmûdO! Lawo!...
Ev ferman ji berê da fermana mala we ye,
Mehmûd Beg ban kir Evdurehman:
Bavê min qapiyê Romê aîdê te ye,
Şerê Etşanê, şer qulipî li milê te ye,
Ji nîro b' şûn da şerê her pênc kurên Brahîm Paşa,
Li Wêranşara şewitî, li ber topê lê me'ne ye.
Bego! Dilê, dilê min dibê ye.
Etşan bişewite wa bi rê ye,
Ji nîro b' şûn da alaya Husên Paşa
Tevî duwazde manqa pêda tê ye,
Tev top û tev bariyê ye,
Şerkî mezin çê bû li Til-Henê ye,
Çandir (çadir) vegirt li Etşanê ye,
Alayî teşkîl kirin li Enabiyê ye,
Tabî kolan li Nafelyê ye.
Şahidê Mehmûd Begê Zerî, exû Nûra, gelek hene ji Til-Henê,
Heta b'Wêranşarê ajot ser topê ye.
Bêlûka Hemdîn Begê hêsîr kirin, kir xanê ye,
Şixat girtin ar berdayê belediyê ye,
Pêşiya duxana ewraqê mehkûma xwe da Til-Henê û Etşanê ye.
Xensê ban kir: Mehmûdo! Lawo!...
Wexta digaziya we were Temir Beg siwarê Hedla,
bavê Xunêsê ye,
Bi qêrînke li Edwan û Ehlil xazanê di ebrê ye,
Xwe bigehînin rêka Nebî Eyûb eleyhisselam,
derbendê di asê ye,
Pêşî li Nebî Eyûb, dawî li Kê ê û li Mîzarê ye,
Dengê qumandara tê, li pêşiyê ye,
Dengê topa mezin, cûra devreş tê, li dawiyê ye,
Qedûr Rahil-Elya bi xwe tevê ye,
Eyb tunîne, ew fermana dewletê ye,
Mêze Gulî sorê mila pan bûn li çolêye,
Pêşiyê xwe da qesra Husênê Qenco û girê Helêliyê ye.
Mêze pêşiya hêsîrê me xwe da qeza diyarbekirê ye,
Û hineka xwe da aşê Qazan-Gêdûkê ye,

Û dawî ma l’ Qerej-daxa şewitî işka xwînê, kaniya di mîhe ye,
Xensê ban kir: Mehmûdo! Lawo!...
Tirsa mi ji wê tirsê ji pê ra li bêsîrê (pêsîr) me xin,
eskerê Mûş û Mêrdînê ye,
Deştiyan û Mehelyan li Gulîmorê Milan bikin neheqiyê ye,
Mehmûd Beg ban kir: Evdurehman ! Bavê min,
Heçî besîrê mayî xelaske bavî bin xetê ye,
Eyib tunîne, bav û kalê me daîm mirin, bi fermana dewletê ye,
Wezîro! Mi ji vira heta bi wira,
Sibe bû şerek çê bû li Etşana xopan li girê Ûzil-Eçanê,
Li ber Dugira ji nîro b’ şûn da şerê topê,
Şer qulibî ser milê Mehmûd Begê Zerî, exû Nûra, mezinê bira...

Ferza Çolo (1)

Dota Hacî Mamo

Ji welatê Xiya,
Sereka rinda,
Çira şevreşiya,
Bînxweşka e’wîla,
Li me’qûd meclîsa,
Temir paayê Millî zengî zêrîne,
Qelengê Ferza Çolo tej dikirin,
Bi xerdelê bergîra,
Boşê loka,
Lokê tewla,
Telê nijda,
Colê miya,
Bi yozê hulika (miya),
Qenterê devan û taliya,
Bi sedhezar quruş,
Qelengê Ferza dibirrîne,
Ji Teyar axa kurê Mûsê Samî re,
Li deşta Sencarê,
Xudanê pênc êl male û malpir î, halxweş î, gelek zengîne....
---
(1): (Mixabin ! Elî Heyder ev strana negihand dawiyê)

Hacî Mamo (1)

Hacî Mamo ***piştî li welatê wî xela peyda bû:***

Dilê min î li yan e,
E’rd î hişke, ezman li ban e,
Çar salin, reh’ma Xwedê nebû barane,
Feqîr û hejar direvin ji malane,
Ji ber zarzar û barbara zariyane,
Di hundirên wan de nema za û nan e,
Evqas îns û cane,
Hal û dema wan nemane,
Çend mirovên biliyane,
Gotin:" Hacî Mamo ! tuyê herê ba dewleta Alî Osman e,
Tuyê ji me re bistînî peran e,
Em tenzakin li nav eşîr û malan e,
Dewlet li bajarê Istanbûlê ye
Sandiqa wê heye li Diyarbekira xopan e ."
Hacî Mamo bervê xwe da wan e,
Sed û heştê hezar quruş stand ji Alî Osman e,
Li bajarê Diyarbekirê kirrî arvan û nan e,
Sal bi sal xirabtir bû li wan e,
E’şîr helak bû, sozê wî bi du salan e,
Li Diyarbekirê fermana Alî Osmên e,
Kutik û defteran li hev dixîne,
Heft salin Hacî Mamo vêrg û salyane nedane,
Teh’sîldarê dewletê, karwan û bazarganê bi hev dixîne,
Bervê xwe didin erdê Xiya, deftera li pêş Hacî Mamo datîne,
Sed û heştî quruşe, deynê dewleta Alî Osmane,
Merivên Hacî Mamo, gelek li dorê civîne,
Xezîn û defîna wî valane, gûca wî nagîne...
Di ber re hêştirêd xûnê dibarîne,
Demê çav li qantira dikevin dizane, ku ji bo doşekêd birsê,
Kulavêd ort bi gul, astar û qulîna wê bi qulbîne...
Birano ! ezê bikim û bilezînim,
Panzdeh hezar malên Xiya ezê bicivînim,
Ez daxaçê van im, nikanim, berxûtekê ji wan bistînim...
Werin ez sozekê di navbera me de dînim,
Ezê deynê dewletê piştî du salan vegerînim...
Ewan dibên: em teh’sîldarên dewleta Alî Osmên in,
Mirovên fermanqulîn in,
Em hatine, doşeka, mal û melal,
Tenê canan jê derîne,

Li nav panzdeh malên Xiya,
Ji me re van peran bi kemilîne...
Teh'sîldarên dewletê ferman dan leşkerê,
Ji gan, ji miyan û hespan,
Ji astar û qulîna bistînine, heta van peran dikemilîne,
yek jî di defteran de dinivîsîne...
Sadiq kurê Hacî Mamo, bi çavê serê xwe dibîne,
Jinêd can, bûkê salekê, şeş mehakê,
Pîrekên serdarên tevra û cilên bi çehn,
Leşkerê turkan destên wan radikişîne,
Doşek û nivînên wanan ji bin dikişîne,
dibe borbora keçan û lawan, giriyê şîne...
E'kaliyê Xalê, Lokê Mûsilê, besrekî girgîne,
Gava çav li teh'sîldaran dikeve, dîn û îman li ser namîne...
Sadiq û E'kalî, yek bi yek sîwarê Mendohê,
yek sîwarê Meşîne,
Serê xwe li heyat û qetebê xwe dixîne,
Soran û galgalan tênagihîne,
Mirina şewitî li ber çavan nabîne,
Destê xwe avêt qevza şûrê devdabanî, pişt hişîne,
E'kalî rakir şilfê darê begêr,
Bi çarde nofirka, bi deh û du qîta,
kirin şerê leşkerê dewleta Alî Osmêne...
---
(1): (Ji devzarê E'lî Heyder e)

Hecî Mûsa Begê

(Xwêtî û Gulê)
Ebdilhadî Mihemed

Eman Gulê, Ermeniyê!,
Te kerem ke ji ber tavê wer ber siyê,
Gula Narîn, axçîka fila, hevde berda ji teşiyê.

Çeng bi çînê, neqşê lengeriyê,
Sifet panê wek sêniyê,
Tu kerem ke elb û eyra-şîrê xwe hilîne, da em herin bêriyê.

Hecî Mûsa Begê zirav siwar bû li xam ciwaniye,
Dike Gula Narîn, axçîka fila, qîza reîsê Dêra,
bên ser dînê Sulmaniyê (Musilmaniyê).

Gulê ban kir: Eman Bego!, mi li diyara diyarê ay zemana,
Li min û li va dema li va dewarana,
Sûnd xwarî me, bi sûnda keşakî û du metrana,
Heta tu goştê canê mi raneke bi wa dirana,
Heta tu hestiyê canê mi nefirîne, bi çakûça û kerbetana,
Tu car nabim jina mêrkê bisulmana (musilmana).

Eman Gulê!, mal şewitiyê, mi li diyara diyarê Abyemana,
Koç û keriyê me, neçû zozana,
Ramîsanê Gula Naarîn, axçîka fila, li cem dilê,
Pir xweştir e ji ramîsanê heft keçikê musulmana.

Gulê ban kir: Eman Bego!, Dêra bavê min pir mezin e,
Keşe û rehab û metran lê rûniştin ser û bin e,
Sund xwarî me, tu car ji mêrkê musulman ra nebûm jin e.

Ax lê eman, lê, lê Gulê!, lê axçîkê ermeniyê, dil kafirê,
Tu li ba dilê mi sifet sorê, fena çirê,
Te gulkê qezê berda ser qonderê,
Gula Narîn meşiya li ser pirê,
Hecî Mûsa Begê zirav bi qevda şwîr (şûr) girt û xar dibirrê.

Gulê ban kir: Eman Bego!, Tu qe mê û xwe me êşîne,
Ezê dengekî dudo li keşa û li metrana biqîrînim,
Tu musilman e, ez file me,
Tiştekî dînê min û te tev tunîne.

Ezê daw û delikê xwe hilkişînim,
Rêka qoce Stanbûlê bigirim, bi ca'dînim,
Textê sultan Evdulhemîd, di bin da bihejînim,
Perda sultan Evdulhemîd biqetînim,
Kêra qelemterşê ji bêriya xwe bi der xînim,
Ezê bi canê xwe ê gewr xînim,
Pêlê xwînê bi ser textê sultan Evdulhemîd da birjînim,
Heft duwelê ecnebî û dewleta Alî Osman bi xwe û te bihesînim.

Kirasekê bê pêsir, bi ser bejna xwe û te da tev de dînim,
Belkî Sultan Evdulhemîd heqê mi ji te bistîne.

Gulê ban kir: Eman Bego! Ezê ban kim,
Dengekî dudo ban rahiba, ban keşa kim,
Mal şewityo! Ma tu musulman e, ez file me,
Ez dikim û nakim xwe ji destê te pak nakim,
Sûnd xwarî me, bi Incîla Isa û Mûsa,

Ez tu car terka dînê Îsa nakim,
Mehra mêrkê musulman bi eşhedê, bi şefae'ta Muhemed,
li ser xwe qebûl nakim,
Zimanê Katolî û Ermeniya li ser xwe zêde nakim,
Ezê ruhê xwe li ber dînê bavê xwe canfîda kim.

Hecî Mûsa Begê ban kir: Eman Gulê!, ew sibe ye, xweş sibe ye,
Tu kerem ke, ezê bîskê werim hinda te ye,
Ezê maç kim cotê memkê te ye,
Mirin heq e, qebra tarî mala me ye,

Gulê ban kir: Eman Bego!,
Te wer mebêje, ji dînê bavê mi ra pir xerabe,
Keşe rabû ji ber rahibe,
Heta ez li darê dinyayê sax bim,
Cotê memkê mi wê ji Miqsiyê lawê apê di mi ra be.

Hecî Mûsa Begê ban kir: Eman Gulê!,
Tu wer mebêje, û me xingire,
Heçî cara ez te dibînim, dilê min mezin dibe, dibe gir e,
Ez bi mêraniyê ji Miqsiyê lawê apê te mêrtir im,
Bi xurtîbûnê jê xurtir im,
Mi wellehî, qesem kire,
Eger tu qîz be, eger tu jin be,
Eger tu bi mêr be, eger tu bi mehir be,
Îllem ezê şevkê bi destê zorê li te bihêwirim.

Gulê ban kir: Eman Bego!, tu bes li mi de, ez gune me,
Ez Gula Narîn, qîza reîsê Dêrê, ez bi xwe me,
Tu musulman e, tu begler e, ez xaçîk im, ez file me,
ez hestîyakî heram im.
Li nav cimae'ta musulmana, ji te ra ser hevde me,
Ez ji dîna, rebena dînê bavê xwe me.
Hecî Mûsa Begê ban kir: Eman Gulê!,
Roja me hilatî qirî perî,
Şewqa xwe da qesra bavê Gula Narîn da, qapîkê her çar derî,
Eman Gulê! Malşewityê!,
Tu ne biçûk e, ne mezin e, tu nuh kemilî,
Heger tu file ye, heger tu çila ye, mi tu qebûl kirî,
Şev û rojê Xwedê bîst û çar sae't in,
Mi seba Gula Narîn, miraq kirî.

Gulê ban kir: Eman Bego!
Tu bibêje faîde nake,

Gotina mêrkê musulman, li cem min pere nake,
Mi ji te ra nego: Sûnd xwarime,
Ez tu cara terka dîna Îsa nakim,
Mehra mêrkê musulman, li ser xwe qebûl nakim,
Rûyê xwe ji hizûra bav û birê xwe reş nakim...?!

Hecî Mûsa Begê ban kir: Eman Gulê!,
Ew havîn e, xweş havîn e,
hêviya xwe dikim ji rebê jorîn e,
Ezê carkê, carkê te bi tenê, li baxçê bavê te bibînim,
Tu zanî, ez Mûsa Begê xwêtî, baxê welatê jorîn im,
Tu zanî, ezê destê xwe li qevda Xelefsorê xînim,
Ezê Xerzaniyê ji ber fota ecem dê bikşîn im,
Ezê Guliyê t'a (te ya) sor û sosinî, li destê xwe bigerînim,
Temamê fila, eşîra bavê te bên,
nikanin te ji destê min biderxînin.
Gulê ban kir: Eman Bego!
Dêra bavê mi biçûk e,
Keşe û rehab û metran lê rûniştin sera sûk e,
Sûnd xwarî me, bi Încîla Îsa û Mûsa,
Ji mêrkê musulman ra nabim bûk e.
Sibe bû, bira nehata,
Bîna bayê li newala,
Sibe bû Hec M6sa Begê zirav, sekinî li orta mala,
Carkê nêrî Gula Narîn qufik hilanî,
ji kûçikê bavê xwe ra, çû hinara,
Hecî Mûsa Begê zirav,
serê xwe girêda bi yazmakê û çar desmala,
Mîrê zirav çente dagirt ji derbê enextara,
Hêdî, hêdî meşiya nava dara,
Guliyê Gula Narîn, li destê xwe gerandî weke cara,
Berê Gulê da çem û şeta û qilîcê behra....

Heftsedê

Berhevkirina **Thomas Bois**

Lê warê.....
Erê Heftsedê, dotmama Genc !
Xelîl axa ji xewka şîrîn hişyar bûye.
Bi sê denga bi dengê zîzî li jinbabê xwe dikit,
qîrîn û hawar û gazî ye.
Dibit:" Erê, jinbabê !, xewnekî min dîtiye:
Cotekî ava li ber darê kinika

Bîracûkê mala babê min zenzeliye;
Cotekî spîndara li ber de şîn bûye;
Cotekî reşmara pê ve hatiye;
Mehfûrekî sor î Xorasanî li bin daniye;
Kerekî beqala bi sê linga hêdî hêdî
xwe li sera gihandiye;
Kewekî sipî zimzim kirî, li serê zinarî dixwendiye;
Teyrekî başûkî li serê kewekî dabî, kewekî firandiye.
Dilo, nemayê...
dê bila nemînim bo siwarê xerîbiyê.....
Lê warê.....
Jinbabê dibêjît:
Erê, keça min Heftsedê !, xewna te raste, derew nîne:
Cotê ava Bêracûkê rondikê çavê teye;
û cotê spîndara bejna teye;
Cotê reşmara kezî teye;
û cotê sêvê Entabî memkê teye;
û mehfûrê sor î Xorîsanî sîng û berê teye;
Kerê beqalî ew dezgirê teye;
Kewî sipî zimzim kirî, li serê zinarê,
ew pismamê te Genc Xelîl axa ye;
Zimzima li milê rastê, giltekî frengî girtiye;
û teyrê başûkî hatî li ser kewekî dabî,
kewekî firandiye,
Ew Erzaîle, li ser rûh'ê pismamê te
Genc Xelîl axa hazir bûye.
Dilo nema o !,
Dê bila nemînim bo suwarê xerîbiyê....
Erê, erê, jinbabê dibêjît:
Keça min Heftsedê, xema nexu, xem xirabin.
Şûl û teqtîr (teqdîr) û miqqederê di Xwedê ne,
Bi ser te û pismamê te tên û betal nabin;
Çigarekî bikêşe, da xema dilê te, pê belav bin;
Her mirov hewdekî gul û rêhana biçînit û xizmet bikit,
şivê desta ewwil, her dê rabit.
Heftsedê dibêjît:
Erê, jinbabê, bi raste, xema naxwum, xem dê xirab in.
Şûl û teqdîr û miqqederê di Xwedê ne.
Li ser min û pismamê min,
Genc Xelîl axa tên û betal nabin.
Her mirov hewdekî gul û rêhana biçînit,
û heft cara bi rojê xizmet bikit,
Şivê desta ewwil, her ranebin.
Min wê sûnd xwarî:

Kesî piştî pismamê min î Genc Xelîl axa,
bi sing berê min şahî nabit.
Dilo, nema o !, dê bila nemînin bo suwarê xerîbiyê....
Lê warê....!
Erê sibe ye, li min tişta zuwa.
Heftsedê, dotmama Genc Xelîl axa,
li jor tewla mala babê xwe ketiye;
Hespekî quntanêr deraniye.
tengê wî şidandiye,
bi şev û rojê ajotiye,
li serê duriyanê sekiniye,
pişt qefla başbazarganê rûniştiye,
Têto başbazerganekî misilmana,
Heftsedê dibêjît başbazerganê misilmana:
Tu bi Xwedê û Mih'emmed pêxemberana,
Te pismamê minê Genc Xelîl axa nedîtiye?
li welatê xeyran û xirbana,
Bajarê Kola Mehmûdî li Tilsîn û Mislîn, welatekî xerîbî ye...
Başbazerganî dibêjît: Erê, Heftsedê pismamê te,
Genc Xelîlaxa e'mrê Xwedê kir ;
min veşart û bi vê destana.
ez hatim şûnana.
Heftsedê dibêjît :
Erê başbazerganê misilmana,
hêviya min ji Xwedê û pêximberana,
Hêj tu ne gihiştî mal,
termê te dayim ser piştê di van hespana.
Lê warê.....! Têto başbazarganekî filana.
Heftsedê dibêjît:
Tu bi Xwedê û Îsa pêxemberana,
Te pismamê min Genc Xelîlaxa ne dîtiye?
bi welatê di xeyran û xirbana.
Li bajêra kola Mehmûdî Tilsîn û Mislîn, bajarekî xerîbiye...

Başbazarganê filana dibêjît:
" Pismamê te Genc Xelîl axa çi nav û nîşane?"
Heftsedê dibêjît:
Roja ji mal derketî, suwarî hespekî bozî bayaziye;
simkotî, simkirî, difin zornayî ye,
Stêra Mexribî rawesta ye,
suwarê ciwanekî Manegîye, manegî dûkixgî ye.
zînê zerê Tewrîzî ye,
Serkel û silah'bend Dirizî ye,
cotekî danisqa pişta zînî çikilandiye.

Ew bi xwe simbêl sor î sosinî ye,
qelûnbeskê Osmanî ye,
berdefka wî kehrebanî ye,
û xencerê wî Salîh'begî ye,
çef û e'galê wî Mendelî ye,
kurk û e'ba ya wî Besrawî ye,
Şalê wî Kermanî ye,
bi çekme ya Siftalî ye,
bi tomamê Romanî ye,
hoçkêd wî sê gazên gaza Qeyserî ye,
pişтqûna boz î beyaz î li e'rdê dikişî ye.
Pêr kaxezekê ji dotmama xwe hinartî bû:
" Par nefer bûm, û ev sala yûzbaşî me".
Başbazargan î filana dibêjît:
Erê Heftsedê !
Min Genc Xelîl axa, pismamê te nedîtiye,
bi vê çavana.
Ez nakim bikim çu bêbextî û çu derewana.
Lê warê.....!
Têto başbazargan î cuhiyana.
Heftsedê dibêjît:
Erê, tu bi Xwedê û Mûsa pêxemberana,
Te pismamê min ê Genc Xelîl axa nedîtiye?
li welatê di xeyran û xirbana.
Li bajêra Kola Mehmûdî Tilsîn û Mislîna,
bajêrekî xerîbî ye...
Başbazarganî cuhiyana dibêjît :
Pismamê te Genc Xelîl axa nesaxekî nesaxane.
ser milê di du Romiyane,
bir û avête xestexane.
Lê warê....lê warê.....!
Heftsedê rabû, çil keç ji bo xwe kom kirin,
Hemî romanî xemilandin.
û ew bi xwe kire diktorê Loqman,
û qesta pismamê xwe kir.
Deh nefer hinartin:
" *Bila hemî diktora derkevin,*
dê diktora Loqman têtin û Genc Xelîl axa sax bikin."
Hemî diktora derketin û hatin diktorê Loqman,
û nizanit çawa xwe bi Genc Xelîl axa bînit derê...
Dest avête strana:
Ava Firatê, çemê bi kend û lende.
Ezê guharê xwe bikim nala,
û bazingê xwe hûr-hûr bikim bizmara,

Ezê kezî xwe bikim tenga,
û biskêd xwe bikim deşevsara...
Herçî gav pismamê min Genc xelîl axa derkevît,
bi koçmal û çadirana...
Û da xek nebêjin:
"eve suwara kurê Heftsedê çi bêkar û bare.
Lê warê...!
Genc Xelîl axa çavê xwe vekir,
Got: "Ev strana te ji kî re girtîne?
Diktorê Loqman dibêjît:
"Heker tu va strana bo min bêjî,
her stranan hespekî didime te."
Dest avête strana, gote:
"Ew çil keçê digel libasê xwe bikin,
Oda başbazerganî odakî şîne,
Kelek û gemiyê di Hacî Bedran axa, tên û dikişîne,
Dê hilo pismamo!, Genc Xelîl axa,
Destê xwe li gerdenê zer werîne...
Lê warê...!
Heke çavê xwe vekir,
û berê xwe dayî, ku dît dotmama xwe Heftsedê,
di vê gavê de mir...
Lê warê...!
Ji bajêrî salî neçime bajarê Misrî ye.
Ezê piştî pismamê xwe Genc Xelîl axa,
Ezê sing û berê xwe bikim li binaxê qebrê ye...
Nemayê, nemayê, nemayê...!
Dê bila ez nemînim piştî pismamê xwe Genc Xelîl axa,
li ser dinyayê...
Lê warê...!
Ji vê odê neçime çu oda,
mamkê min nabîne befrekê li zozana,
û xwe kişa, îna li serbanê di vanî oda,
Ezê desmalekê şîn bikim, bavêjime çavê xwe,
û ezê xwe avêjime avê, bila bikim bi ruh' de....

Helîmcanê !

De can bi can be, Helîmcanê !
Ê lê Helîmcanê,
Heyran, ez ne tî me û ez ne birçî me,
Ez li ber sihka Bedlîsa xopan rûniştîme,

Ê lê Helîmcanê,
Heke tu avkişênî, ez gelekî tî me,
Heke tu nanpêjî, ez birçî me,
Heke tu singfiroşî, ez mişterî me...
Heger tu na firoşî roj hezûra heq,
Ezê li ser pela selatê,
Destê min û dawa te,
Ezê li Helîmcana xwe de'wecî me,
de can bi can be, Helîmcanê,
Bav kopekî, mêr xulamê,
Ê lê Helîmcanê ez heyran,
Bedlîs bişewite, wa li wê ye,
Heyfa min nayê li ser malê dinyayê,
Evê teresê polîs destê min girêdanê,
Berê min dan mîrata eskeriyê,
Ez ne ketime ber wê heyrê, ji mi're tê ye,
De can bi can be, ê lê Helîmcanê,
Bava kopekî, mêr xulamî...

Heme Teyar

(Ev stran ji aliyê Albert Socin û Eugen Prym ve di sedsala Nozdehê de li Zaxo hatiye bihîstin û nivisandin û li Petersburgê/Rûsiya hatiye belavkirin) [T8pguhastin:Cankurd]

Hêy... Hemeteyar vê dibêjîd dayê,
Li min bike tegbîrê rayê
Ez dê rabim çime (biçime) Bexdayê
Go: Kurê min Zibêr paşa xweş paşa ye
Zibêr birayê te ye
Ew hakimekî bi zorbe ye
Dê tu here, dilê te ye
Vê Hemeteyar tuyî delalî
Çenteyeg (çenteyek) lee'l û mirarî
Bo wezîrî bike diyarî
Hemeteyar derketiye
Ji Amêdiyê bi xwar ketiye
Çenteyeg lee'l û miralî (mirarî) vî biriye
Ji Amêdiyê suwar bûye
Li Navkurê peya bûye
Ji Navkurê suwar bûye
Li ava Zey derbaz bûye
Li Heblêrê (Hewlêrê) peya bûye
Ji Heblêrê suwar bûye
Li konaxeke vê çûyî ye

Li gundekî peya bûye
Ji wî gundî suwar bûye
Sê konaxa vê çûyî ye
Li Kerkûkê suwar bûye
Sê konaxa vê çûyî ye
Li Bexdayê peya bûye
Qesta wezîrî kiriye
Ew diyarî bo wezîrî biriye
Kêfa wezîrî pê hatiye
Wezîrî vê dibête
Hemeteyar te kî divête?
Hemeteyar vê dibête
Min paşay ji te divête
Go ev wezîr e xweş wezîr e
Ew paşay e bê qusûr e
Bo Hemeteyar vê dabî (dabû) semûr e
Go hatî mala Hedrîs e (Edrîs e)
Ew nav şûla qewî pîs e
Hemeteyar ser xwe bi bêrî kîs e
Hemeteyar vê rabûye
Wezîrî xilat kiriye
Kîse li ser xwe bibiriye
Ji Bexdayê derketiye
Ew hatî Karaçolanê
Kaxezek hinartî bo Xalid axa, mîrê Dobanê
Em dê kîne (keyne) du mîranê
Hemeteyar xweş kelat e
Kaxez hinartin welat e
Bo eşîreta dane xilat e
Ji Karaçolanê verê bûye
Li Kerkûkê peya bûye
Bi çevê rojê ve hatiye
Li Heblêrê peya bûye
Ji Heblêrê derketiye
Li ava Zey derbaz bûye
Hemeteyar xwey kîn e
Kaxezê hinarte bo Behdîne
Hemeteyar xwey mekseb e
Ordî dêna girê Mihemmê Ereb e
Girê Mihemme Ereb e rûniştiye
Ordiya xwe vegirtiye
Kaxez Behdîna gerayiye
Ew Behdîna verê bûne
Ji Zêrbarê bi derketîne

Girê Mihemme Ereba suwar bûye
Hemeteyar çav bi kêl e (kil e)
Tu şeng e suwarî di kehêl e
Ordî di înadîne Simêlê
Li Simêlê ordî bûyîne
Çen (çend) eskere vexundîne
Li Simêlê kom kirîne
Ji Simêlê suwar bûye
Li Asîhê peya bûye
Hemeteyar sing bi go ye
Xalid Axa dîlî çûye
Go em dê çîne (dê biçine) ser Zaxo ye
Ew rabû subehî zû ye
Eskerê xwe rakiriye
Li ber Zaxoyê ordî bûye
Top dêna li Tirbê Ciho ye
Zaxoyê rabin subehî tîtave
Ordî dêna şikefta zav e
Şer kirî li pişta xendekê
Hedê Namirê pi (bi) çavekê
Evro diçin tola Hesen Begê
Simo, Nêmir herd (herdu) birane
Herduka şîrêt (şûrêd) xwe kêşane
Evroke diçîn tola mîrê Şêxan e
Şer kirî li pira Mezin e
Dez (dest) avêt şîrê (şûrê) sosên e
Evro diçin tola sayê mezin e
Şer kirî diwazde Milan e
Şêxa dane vêtkin şedîdan e (vê dikin li cedîdane!!)
Berwarî mandî amane (man remane)
Ha (hat) Tetarê Nîrî (Nûrî) ye
Dez (dest) avêt şîrê (şûrê) Misrî ye
Derbê ewwil temiriye
Hat sarêmê (şûrê) bi ciwanî
Tu çi şêreg (şêrek) ji van şêran î
Ji hemiya vî desêlanî (dest hilanî)
Şêxa û dana (zana) rabûne
Ew hemya bi xar çûne
Berwarî xelas kirîne
Nee’man Beg vegeriye
Suwareg (suwarek) bi dîv (dûv) ketiye
Şaşiga xwe avêtiye
Suwar li şaşigê peya bûye
Ew ji ber suwarî xelas bûye

Suwarê vê gihîştiye
Şêrî xwe avêtiye
Suwar li şîrî (şûrî) bûye
Heta şîrê (şûrê) xwe lê girtiye
Nee'man Beg zêde kiriye
Xencera xwe avêtiye
Li xencerê peya bûye
Heta vî xencerê standiye
Nee'man Begê zêde kiriye
Ji ber suwarî xelaz (xelas) bûye
Şêxa dana (zana) zivirîne
Ser ordiyê peya bûne
Namûsê xwe vê kirîne
Berwarî qut kirîne
Qubad paşa ji qesrê hatî xware
Bi gel xwe man çen (çend) suware
Çû bin xîvetê Hemeteyar e
Go: Me sulh e, me hîvî ye ev care
Qubad paşa vehatiye
Bin xîvetê peya bûye
Hîvî ji Ehmed paşa bûye
Qise li ser xwe bibiriye (biriye)
Ehmet paşa vê rabûye
Ji ber Zaxoyê ve çûye
Eskerê xwe vî biriye
Ew li Akrê peya bûye
Derba vî zêde kiriye
Qîzê di wezîrî vê dayiye
Ew hemiyê sulh kirîne
Zibêr paşa paşayê Behdîna
Hemî hakimê razî kiriye
Kelha Amêdiyê rûniştiye
Hukmet li hemî Behdîna kiriye
Go: Hatî careg (carek) ji cara
Vê tşimbîne (dişibîne) belgêd dara
Ez hatim ji wê ve
Rehmet lid ê babe guhdara…

Henîfe

Henîfe keçka keyê ye,
Keçka meleyê deştê ye,
Xeftankî şamê lê ye,

Çi behnek çînar lê ye,
Dilketim wê behnê ye,
Ezê bi çeplê te bigirim,
Bavêm binya xetê ye,
Emê herin Bêrûtê,
Bêrût weleh l’ ber behrê ye.
Henîfa çû bû cila,
Cil şuştin b’her du mila,
Porê sor ketî mila,
Tama memkên te xweş in,
Mîna qinê behîva,
Mîna qinê giwîza,
Mîna rûnê ê hîza,
Ezê bi çeplê te bigirim,
Bavêjim tara fila,
Henîfa dît l’ ser qubê,
Bejn ziravê, j’ darê rimê....

Hesso rebeno!

Hesso Goyîno, bayê sibê li min rabû,
Şehîd şihûdê Hessê Balo gelek hebû,
Li nîv meydanê çirp li ber axayê xwe peya bû,
Rabe, suwar be, bila malkekî mîrata bê,
Da nebêjin koçka wê mîrata Xelîlê bi lav nabê,
Kî digo Hesso Êkane çê kir,
Kibara sibê, zînê hemdanî lê kir,
Şehde û şihûdê Hessoyê Balo gelek hene,
Serê xwe bi goriya serê axê kir...
Ezê bi girê Mehmedana şewitî ketim, ji giranî gir gûnike...
Ferho gazî dike:
Bira ka namûsa te kirî?
Birê min wê çawa namûs nekirî?
Min wê bi şelîta kona hesirandî,
Eza rabûme ser rikêbekî,
Min wê rima li darzê qolincê da,
Min got: Eve heyfa Hessê Balo, qumandarê ser bilûka,
Ezê giranî ketim, giranî û peyda,
Ferho got; Bira ! Ka namûsa te kirî?
Çawa wê Bişêrê Çeto nîvê suwara ferîqa kirî,
Min wê li şelîta kona asê kirî,
Ezê rabim ser rikêbekî,
Min wê rimekî li darza qolincê da,

Min got: Eve heyfa Hessê Balo,
Xulamê banê min rebenê,
Xulamê ji xulaman î Zêda...

Heynayê!

Heynayê lê Heynayê!,
Ez ban te dikim, çima nayê,
Lingê min xistin qeydayê,
Stoyê min xistin lelayê,
Destê min xistin kelepçayê,
Berê min dane serayê.
Heynayê lê Heynayê!,
Tama memkên te xweş in,
Wek xurmayê Bexdayê,
Wek hejîrê Rihayê,
Heynayê lê Heynayê!.
Xwedê o, xweş Xwedêo!
Kengê her û kengê bêo !
Tu gewra min rakî ji xewêo !
Çavê min lê ket bejnêo,
Xulam bejn û balêo.
Ezê bi çeplê te bigrim,
Bavêm gundê Herbêo,
Cem Mehmûdê Korêo.
Xwedê o Tu bakî rakî,
Gewra ji xewê rakî,
Bazina di desta kî,
Xilxala di linga kî,
Eyûna di ber riwa kî,
Xizêma di poz ra kî,
Tu qîza behra xorta kî,
Ez terka çavê reş nakim,
Heya qiyamet rabe,
Pêwir û mêzên l'me dayê.

Henne û Medo

Berhevkirin: **Thomas Bois**

Go hebû û nebû, çêtir ji Xwedê nebû. Metranik hebû, li dêrê Zehferanê rûnitî bû. Henne xulamê vî bû, sêh xulamê wî hebû (n), Henne mezinê wa bû. Metran e'wênya deman kir hasilê wî, Henne şant (şand) ser hasilê. Ev û yeg (yek) diçûn e'wênya, rûnişt li mala şêx. Keça şêx heye bê zewace, navê wê Medo (1) ye, gellik spahiye (2). Bi Henne dinêrê, ew

û keçikê henek çê dikin. Henne bîrê keçikê nebir, go bibê filleh. Keçik lê bû bela. Şêx bihîst, dey nekir. Şêx got Henne, go wilo meke bi keçikê, aqilê wî mebe, tu fellehî û ew musilmane, ji te re nabe. Go hajê min jê nîne. Keçik li Henne distirêne:

"Mih'emmedê Henne ji mal hat nas nekir,
Me pirsa gohtina xwe jê nekir,
Rû wê (yê) min ramîsan nekir.
Mih'emmedê Henne suwar bû li dondilê,
Ji dêrê hat ser hasilê,
heke li vir nebû, ezê birevênim bibem Mûsilê.
Ew e'wîna bi geya yê şîne,
Berdana Henne qet tu nîne,
Înşallah ez ya wî me."

Henne lê vegerand:
" Go keçê nabê, vê şuxul li me xarê be,
diyê te û bavê te qayîl nabe."
Keçik bi vê xeberê da girî. Gund hemû bihîstin, rabûn li Henne lêxin. Yek ji gund go lê mexêne, Metran bibhîse, vê gilhê me bikê, vê gund batmîj be. Lê nedanê, Henne hasil temam xelas kir. Rabû, siwar bû bê dêrê, keçik vê re hat. Kirin û nekirin, keçik vegerê, venegeriya. Bû bela li Henne, vê re hat dêrê. Metran bihîst, go ev çiye Henne ? go h'alê h'ewal eve, dibêje ji metran. Go ê qence. Du roj sekinîn, şêx û gundî hemû hatin ji ewênya hatin dêrê, gon (gotin) em keçê xwe nadin felleha. Henne û Medo birin ewênya. Go musilman be, keçik bustîne, şêx dibêje: Sihir jêra çêkirin, aqilê wî birin, bi wa ra çû Henne, çû E'wênya. Keçik dibêje: Hûn serê min bibirrin, terkê wî nadim, felleh bi kêfê wî ye, musilman bê dîsa kêfê wî ye. Go; Ez musilman nabim û keçik nastînim. Keçik digrî. Henne rabû bê mal, Medo rabû vêra. şandin Mêrdînê, keçik bernadê. Ew û keçikê hatin Mêrdînê, çar ji gundî vê ra heye, çûn cem paşa, meclîs civiya, felleh hatin meclîsê, wekîlê metran hat xoce Cabbûr (3). Ew û paşa li hev dan bi xebera. Xoce Cabbûr go emê felleh bikin keçik. Paşa go nabê, bara keçik bê camiyê û bara mêrik bê dêrê û dîsa bara hevdu bistênin. Go: nabe, xoce Cabbûr, keçik heband û di dûv hat. Keçik dibêje: ezê felleh bim û mêrik dînê xwe bernade. Paşa heyirî me, nizanê çi bibêjê, go: emê bikin hewale cem mesûrê (4) Diyarbekrê, cem (5) xoce Mûsa. Gotin: bara bê, meclîs hemû felleh û musilmane. şandin Diyarbekrê Henne û keçikê. Çûn Diyarbekrê, cenderma (6) bi wa ra heye, teslîmê meşûr kirin. Go: Çî hewale? Meşûr got Henne. Go: Efendim! ez xulamê metranim, ez çûm ser hasîle E'wênya, ev keça şêxe - keçik rabûye li dîwan - li me bû bela, me gotiye ez te nastînim, go çima? Me go ez felleh me û tu musilmanî, nabê. Henne dibêje: Vaye keçik, ne wilo ye? Keçik go: belê. Mişûr go: Were tu musilman bibe, emê keçik li te meher bikin. Go: na...na...ez nabim musilman. Meşûr Henne qani' kir, go: Musliman bibe, ezê te çê bikim midûr, te bişênim ser E'wênya. Go: Bara (bila) be. Henne şaş bû. Birin alî camê, şehde rakirin û musilman kirin. Xanîk malik jêra dan, û tê da rûnişt, ew Medo meher kirin, tayînê wa bi derdikeve ji serayê. Mahya dima, poşmam bû, nekirin midûr. Di vê birevê, riyê wî nîne, Henne daloqî, dilê wî ji Medo sar bû, ji boyî wê xeberê go musilman bû. Ma Medo distrêne, li ber dilê wî tê, ew nema dikene:

" Li me hat roja înê,
Paşa dûv te dişînê,
Dilê te ji me dimînê,
li min û li vê defterê,
Ezê vegerim cihê berê,
Ez hatim Diyarbekrê,
Lê ne bi vê xeberê...

Medo rabû gotiye:
" Malê (7) me rêk e,
Gava dilê te dixwazê rabe çêke,
Gava tu herê ez qayîlim...."

Medo dibêje: Dilê te namîne, tu divê emê felleh bin, emê me'lûmê qensera bikin, ev dînê musilmana em nahebînin; emê vegerin dînê felleha, me koteke, me şenq nakin. Nema zane Henne çi bibêje, şehda rabûn û musilman bû.
Medo distrêne:
" Go (8) Mih'emmedo (9) pi (bi) te ra soze,
Mehêle xeberê te bigre toze,
Heke qenc û heke xerab,
Emê xwe bavêjin bextê balyose (10),
Ew Diyarbekrê li ser til e,
Bejna Medo weke gul e,
Emê bêjin balyose; emê bên ser dînê felleh,
Dismalê Medo ji mûmiye,
Alva casûs hene (11) birê Romiye,
Rabe de em herin cem balyose,
de em binêrin, (12)
Gohtine bejna (13) me ne dirêje, girovere (14),
Medo (15) rabe de em herin,
Li gohtinê (16) qansera em binêrin..."
Şeş meh man bi vî karî, ma'lûmê qansêr kirin, Henne çû mala qansêr, qansêr çû serayê, ew paşa şer kirin, qansêr rabû suwar bû here Stanbolê, gilhê paşa bikê, nehêştin go herê Stanbolê, vegerandin. Henne bû felleh û Medo ma musilman. Paşa nehêşt, bir cem hermatê. Paşê subeha (17) leh'dê, Medo rabû ji mala paşa, xwe dizî, hat mala qansêr cem Henne, paşa lê pirsî, bi derket li mala qansêr cem Henne, paşa deynekir, qansêr rabû, destûrê va da û bûn felleh û hatin Mêrdînê. Li Mêrdînê rûniştin, du kurê wî hene.
Tu ji me ra sax.

Têbîniyên berê:
(1) Medo (di her derekê de). (2) Spehiye (3) Jabûr. (4) Meşûr. (5) Cam. (6) Gund. (7) Go rabe me. (8) Go. (9) Dê. (10) Beylosa. (11) Za. (12)alvaye (alva heye). (13) Casûs. (14) Giroverê. (15) Erê Meddo. (16) Li ba gohtine. (17) Subehe.

Hiso!

Hiso çûye Mêrînê,
Hiso way,
Toltajîkî b’xwer tînê,
L’ser do’şekê datînê.

Şêxmûs tê dimeyzînê,
Hiş û aqil namînê,
Hiso way.
Sênca Hiso sor çilo,
Tu l’ rihê Hiso binêr,
Mîna teriya kûçikê şilo.

Mala Hiso li nav mala,
Dermanê rihê Hiso,
Hebik rêxa dewara.

Mala Hiso l’Erişkê,
Dermanê rihê Hiso,
Hebik zelqa mirîşkê.

Gewr’am

(Gewra min)

Bejna te kehrê keleha Wethayê,
Mi hoste berdanê, ji aliyê Bexdayê,
Mi hoste berdanê, şagirtî nayê,
L’ ser sing û berê gewr’am, kêfa dinyayê.

Bejna te kehrê, kelha Bitûmê,
Sefer kira bû, ez pê de diçûmê,
Ser sing û berê gewrê, ez teqdîr dibûmê.

Bejna te kehrê kelha hesinî,
Mi hoste berdanê şagirtî sekinî.

Hey weleh tu dîn î,
Bileh tu dîn î,
Singê te gewrê tasik zêrînê.

Weleh û bileyê,
Xezalek geleyê,

Singê te gewr in, berfa çeleyê.

Çilo mi gotî, bi kêfa mi re yê,
Singê te bexçê gula, navê min tê de yê.

Singê te gewrê, bi qifl û mifteyê,
Weleh tu hatî, bileh tu hatî,
Tu wek kewek rebat î,
Tu wek sêvek xelat î,
Ser çav mi'r hatî.

Gewrê!

(Lê Gewrê!)

Lê gewrê man û man,
Delalê man û man,
Kiras-sorê hebreman,
Serê memkê te hildan,
D' paşila te de xwey dan.

Min serê memka giwaşt,
Sê fincan av j' hatin xwar,
Min fincanek jê vexwar,
Û w'ez bûm wek zîvê al,
Ez bûm wek markî teyar.

E'j kaşê Kûdê hatim xwar,
L' Qera'îkê bû hawar,
Sê siwar derketin bi xar,
Yek lawê Elyê Biro,
Yek lawê Hefsa Kûnxwar,
Yek law' Mehmedê Biro,
Karê oda xwe kiro.

Lo erdiko beyaro,
Min lê çandî xiyaro,
E' çibikim j' dosta bi yaro,
Min cotê memika xwaro,
Yek sêv, yek pirtiqalo.

Lo erdiko hilmiştî,
Mi' sê gav lê rahiştî,
E' çibikim j' dosta b'dergistî.

Heçî çû odê !
Xizmeta odê kiro,
Nanê xwe b’ xwe re biro,
Tifî li maqûlê wilo,
Ko te kev halê wilo.

Hey gewrê, gewrê, gewrê,
Tama memkên te xweş in,
Mîna hejîra Hewrê,
Ezê b’ çeplê te bigrim,
Bavêm seraya Stewrê.

Gênco !

Go (1) hespê Gêncê (2) min î reşe,
Riye (3) cada (4) dike meşe,
Gencê xwe bibînim gellik xweşe...
Bejna mina qutî mutî,
Kêr û meqes pi (bi) ser şemotî,
Dostim hebû ji me xeyidî,
Me xeber gotiye çû felitî,
zuman goşd (goşt) bû, hew xelitî...
Hespê Gencê me qula ye,
Ji xwe bi rext û bi reşma ye,
Gênco bajo malê me ye,
Sîngê min doşeka te ye,
Memka min balgihê te ye,
bixu û vexu besî te ye (5)...
Minê Genca (Gêncê) xwe dî ser sergoya,
Tezbî (tizbî) berda zo bi zo ye,
Hin dibê heyve û hin dibê ro ye,
Dostê min (6) delala li Hazro ye,
Hekeabor li vir nebû, ezê birevînim,
kevrezo (7) cem Haco ye.
Hazra şewitî xwş her ba ye,
Set (8) mal felleh têda heye,
Hecî dostê wî felle ye,
e’mrik ji e’mrê (me) zêde ye...
Minê Gênca (Gêncê) xwe dî li beravê,
Şewqê da bû bejna ziravê,
Ezê Gênca xwe birevînim ji mala bavê...

Minê Gênca (Gêncê) xwe dî li zikakê,
Bira dengek ji me ra bakê, wê navê min bi buhakê... (9)

Minê Gênca (Gêncê) xwe dî ser qarîşê
Tu tixafem (10) û li kaîşê,
Gênco dengê Nûrê ket (qet) nabihîsê...
Gênco were, Gênco were !,
Ji mala (11) me mere,
Kim î (kum) fesa, yesma di ber e...
Gênco were li ber şibaka,
Me bikşêne bi kotaka,
Bi Xwedê ya min û Gêncê min soz yek e...
Qalûnê Gêncê min yasîmî,
Dest birîndar bû ji kerîmî (12),
Gênco qurba (qurban) tu h'ekîmî...
Xeftanê Gêncê min etlese,
Tê gundê me ji xwe (13) bilez e,
Gênco mi (ji xeyra) birevîne ji xwe ra, bese...
Hazra (14) şewitî bi kevire,
Gêncê min hat, wek (weke) agire,
Gênco Nûrê (15) revand, ji xwe re bire...
---

(1) got (2) Gencê (3) riya (4) cadê (5) basyî (6) besyî (7)multecî (8) sed (9)van rêzik ducarkî bûne (10) diaxivim (11) malê (12) tekrîmî (13) ew ji xwe (14) Navê gundekî ye (15) Navê keçikê ye.

Gidyano!

(De Gidyano!)

De Gidyano! De Gidyano!,
Bîra gundê me xetimî,
Keçikê digot: Sing û berê min mîna qeymaxê miya,
Nivîşkê serê sibehê, min ji delalê xwe re danî,
Ser nankî genimî.....
Min sund xwariye bi Quranê,
Ez tu car narim wî hundirî, wî kavilî,
Wî mîratî, wî sitimî.....
Min dî ji nîvê şevê pê ve,
Delalê dilê min di nav cihê min de diqedimî.
Mi go: Bila Xwedê ji melayê gundê me nexweş be,
Çava (çawa) mehra min birî, li wî kotîkî, li wî çepelî,
Li wî ma'dzerhemî.
De Gidyano1 De Gidyano!,
Bîra gundê me bê qam e,

Jêr de kanî ye, jor de cam e,
Ez û delalê dilê xwe bîst û çar saeta tê de mane,
Min nizanî bû, ko dilketina min û bejna zirav,
Sala vê salê bi milam e.

De Gidyano! De Gidyano!,
Delalê dilê min dike di xopanê gundê me de avanîkê çêke,
Ezê bişînim Midyata xopan dû Şam û Şekiro,
Bila bên, cîkî ji min û bejna zirav li tebeqa jorî çêke,
Kul û kederê bejna zirav, di ser dilê min de şax berdane,
Bûne kotik û merez û xem û xiyal û girêk e,
Şixula min û bejna zirav li erdana xira bûye,
Belkî Rebê a'lemê li ezmana ji ba xwe çêke.

De gidyano ! De Gidyano!,
Roka me li navbeyna nîro û e'sir dageriya,
Xwezila ji xeyra Xwedê re,
Ezê ji kevoka bibûma kevokê xubariya,
Şevkê minê ji nîvê şevê pê ve xwe berda hebsa Mêrdînê,
Nav girtiya û nav hebsiya.
Digo: Delalê dilê te rakirin, dane ber qundaxê eyneliya.

De Gidyano! De Gidyano!,
Bi ser min û delalê min de, hat payîzê wextê tirî,
Min dî şevkê ji nîvê şevê û pê ve,
Dê û bavê min li hewşa me sekinîn, pev şêwirîn,
Keçikê gazî dikirê digo: Lo, lo lawiko!
Mala bavê te şewitiyo!...
Rojkê were bi qewil û resûlê Xwedê,
Min ji mala bavê min bixwazê....
Sed wa'de, li canê min keti be, ko ez ne dam te,
Ezê serê sibehê rabim bi dawa taqî bigirim,
Li bav û bira herim gilî,
Qatî nebû, miradê min û bejna zirav,
Ezê serê sibehê rabim destê xwe di kêlekê xwe yî vala xînim....
Ezê li ser rêka welatê xerîb û xurbetê,
Bi dû bejna zirav de dikewkirim,
Qatî nebû, miradê min û bejna zirav,
Ezê herim di mala xelkê delal de rûnim ne mehirkirî.

De Gidyano! De Gidyano!
Navbeyna min û bejna zirav bi dîwar e,
Alî kils e, yek nikar e,
Cotê memkê min xanim xatûnê yek sêv û yek pirtiqal e....

Keçikê gazî dikir digo: Lo....lo! Lawiko!,
Şevkê ji nîvbenda şeva û pê ve,
Were tewafa singê berê min keçikê,
Ji te re xweştir e ji teberika mala şêxê Kal e.
Ji girêdana piştê ber jor de, tu çi dixwazî ez minêkar im,
Ji girêdana piştê û ber jêr da, ez mirîda mala şêxê Kal im,
Çi bixwazî ez nikarim.

Gulê, gulê

Kevoka Qitirbilê,
Qeymaxê ser satilê,
Gul dosta axê minê,
Lawê Zeyto j' xwer birê...

Bir xopana Mûsilê,
Destê xwe kir paşilê,
Çi paşilek xûydayê,
Serê memka hildayê,
Memik para xortayê,
Tiştik me tê, ne mayê...

Ez naçim bexçê gula,
Ez narim taxa fila,
Lê gulê, gulçîçekê,
Çavreşê, meşordekê, *(meş+ordek)*
Rîhana li ser doşekê,
Ez rûniştim li kêlekê...

Ezê gulê birevînim,
Bibim bajarê Swêrekê,
Heçî bi dilê xwe zewicî,
Sê ro dizîn ji felekê...

Ez gul im, gulsipî me,
Nav bexçeya efendî me,
Dosta lawikê xwey cindî me...

Gulê

Hay lê Gulê, lê Gulê!,
Eman Gulê, yar Gulê,

Dem û dewran Gulê,
Derd û derman Gulê.

Ehtîqat û nezan Gulê,
Dîs l'benga Xortan Gulê,
Eman gulê, yar Gulê,
Beybûn û qurnefîlê.

Gulê gulçîçekê,
Rêhana li ser doşekê,
Destê xwe xist kêlekê,
Ziravê, meşordekê.

Hay lê Gulê, yar Gulê,
Destê xwe xist paşilê,
Çi paşilka xweydayî,
Serê memika hildayî.

Eman gulê yar Gulê,
Der û derman Gulê,
Dem û dewran Gulê,
Ihtiqat û nezan Gulê.

Gulê !

Gulê, gulê, lê gulê, lê gulê!,
Gulê tu metka Ferec e,
Bi xeftanê melemenc e,
Tu ji alî malê ne gence,
Gava şer ban li nevalê,
Sê siwar derketin bixarê,
Yek xelîlê Xezalê û yek hiseynê Delalê,
Gulê ebûqatê,
Bê l'anet bavê hatê,
Te xwar dîkê sibatê.

Gulê, Ay lê Gulê !

Eman neman, Eman neman,
Ez heliyam tu di min nema!....
Bejna te zirav e, tak rêhanê li ber avê,
Şaq û berê xwe berdane li vê navê,
Ez xulama şêbiskê te sorî henekirî,

Li ser hinarikê rûkê te, da silavê,
Mi dî sibehê gewra min rahişt kûzê xwe,
çû mîrata kehniyê, avê,
Ezê çiqas xiyal û bala xwe didimê,
Neqeba cotê zermemika, serê çeleyê zivistanê,
Şil dibûyê, ji avê yê, ne welleh ji xunavê,
Mi dî bihna qûtya gulyaxê,
di ber pişta bejna zirav de bihin da....

Kalo rebeno!

Kalo ! rebeno! Zozan bişewitin,
Belê ho ê kalo! Zozan wa bi cî ye?
Hezar û heftsed suwarê di Zîlan
û Heydera Xalib axa kirin karê xwe ne...
Diçin xirabkin (bikin), Xirba Zila şewitî,
û Meh'ê, kekê Gewrê dikujin, suwarê Zerdekê...
Delo, ho ê kalo! De lolo, xwarzî te ye...
Kalo rebeno! Zozan bişewitin,
Delo ho ê kalo! zozan î şîne,
Hezar û heftsed suwarêd di Zîlan û Heydera kirin,
û kom kirine,
Diçin, xirab bikin, Xirba Zila şewitî û
Meh'ê, kekê gewrê, dikujin suwarê Zerdekê...
Xeyret û namûs li dor te nîne,
Delo, ho ê kalo, zozan bi semaq e,
Hezar û heftsed suwarê di Zîlan û Heydera Xalib axa
kirin bi tifaqe...
Diçin, xira bikin, Xirba Zila şewitî,
û Meh'ê, kekê Gewrê, bikujin suwarê Zerdekê...
Bira ellah û îman Ellah, heko tu neçî,
arî Meh'ê, kekê Gewrê nekî,
Ez dê xwe ji te berdim bi telaqe...
De lo lo, Kalo!....

Kanî

Kaniya serê Sirtikê!,
Çavreşê, meşqitikê!,
Tama memkên te xweş in,
Weka hêka qitikê,
Ezê bi çeplê te bigrim,
Bavêm qeza Dêrikê.

Min û Kaniya Merzeqa,
Eniya qewra min bi deqa,
Heke tu delala min î,
Destê xwe bi destê min kî,
Ezê bi çeplê te bigrim,
Bavêm her du Sinceqa.

Kaniya serê Mêrgêo!,
Kengê her û kengê bê o,
Ez xulamê bejn û balê o,
Heke tu delala min î,
Emê herin binya xetê o....

Kejê

Berhevkirina : **Thomas Bois**

Saliyê Naso dibêjit:
Wey lê Kejê, te kir, te kir, lê lê te kir, te kir,
Wey lê, Kejê, mal xirabê, te şûlekî bi dilê xwe kir,
Te destê min ji Mîrê Paloyê vekir...

Xatûn Kejê dibêjit:
Erê, Saliyê lawo!, min kir, min kir,
Min destê te ji Mîrê Paloyê vekir,
Dê hela bi çengelkê sorkejê bigire birevîne,
û bibe mala Mihemedaxa li Diyarbekir...
Gava Kejê wa gotiye,
Saliyê Naso bi çengelkê xatûn Kejê girt û suwar kiriye,
bi şev û rojê ajotiye...

Saliyê Naso dibêjit:
Erê, Kejê tu here li nav Hirîma,
Kejê, li nav Zariya.
û ezê herim koçkeka xirabê.
Axa yê giran digel min çiye?
Xatûn Kejê bi cihê Hirîman û Zariya ve çûye.
Saliyê Naso derê koçkê sekiniye,
silavekî bi xêr li Mihemed axa wê kiriye.

Mihemed axa dibêjit:
Erê Saliyê Naso tu bi xêr hatî,
l'ser serî ye,

Belê ka bo min bêje,
Şûlê axa yê giran digel min çiye?.

Saliyê Naso dibêjit:
Erê, Mihemed axa, şûlekî mezin qewimiye.
her du kurê di Mîrê Paloyê min kutiye.
Min xatûn Kejê ji canê xwe re revandiye,
min wê qesda Xwedê û qesda mala te kiriye.

Mihemed axa dibêjit:
Erê, Saliyê Naso, wayê, sed car wayê;
befr û baran lê kir digel vê bayê.
Mîrê Paloyê beraz e û zilm e li dinyayê.
em feqîr û jar, Mîrê Paloyê derheq nayê.

(Diyar e ev parçeya stranê bi giştî wek gelekên din nehatiye nivîsandin.)

Kejê!

Tu kej î, tu kej î,
Dilê min ketî te jî,
Çogê min şikestin,
Nikarim herim, mala xwe jî.

Bejna keçikê tayê tirincê,
Diranê mehrûmê heba birincê,
Destê, çavreşê dermanê qolincê,

Weleh bileh tu kej î,
Dilê min ketî te jî,
Çogê min şikestin,
Nikarim herim, mala xwe jî,

Kevanjenê!

De bijen, bijen Kevanjenê!,
Sêviya bavê ser Hesenê,
Bû pepûka ber bedenê,
Xwelî l'serê te b'tenê.

Kevanê te mişmiş e,
Toq benya xuş e, xuş e,

Memkê gewrê sêva tirş e,
Li ber xwe bir qal û qirş e.

De bijen, bijen Kevanjenê!,
Kevanê te hirmê ye,
Bîstkê lêxim ji kêfê ye,
Piçkê pembo l’ ber bê ye.

Garana l’ser sergo ye,
M’d kerandî b’şev û ro ye,
Çavê wî l’keçka do ye.

Heb b’ heb jê dikirî,
Teres l’ keçkê fitilî,
B’ şêx û mela t’ a min î,
Mehbûba l’ ber vî dilî.

Kezîzer

Kezîzerê, kezî zer,
Kezîzerê lewendê,
Sing doşek, balif zendê,
Zeriyê t' were (tu were) dîlanê,
Gewrê were govendê...

Kezîzerê kezî zer,
Xulama memkê girover,
Serî sore; binî zer,
Mîna berfa newala,
Siya dara tim li ser,
Tu j' govenê (govendê) were der,
Te ramîsim car din her...

Kezîzerê min sisê ne,
Her sê delaliyê dê ne,
Yek min, dido xelkê ne...

Lo erdiko beyaro!
Minê çandî xiyaro,
Çi b'kim dosta bi yaro,
E’sil dosta qîzê ne,
Mîna şekir şîrîn e.
Mînaagir bi tîn e,

Mîna gula bi bîn e...

Kezîzerê!

Kezîzerê kezîzer,
Li serî destmalek zer,
Qamek qut î girover,
Tu j’ govendê derkev der,
Ez t’ ramîsim dîsa her
Xeyr û guneh j’ bavê ter’.

Kezîzerê kezîzer,
Mîna berfa l’ zinara,
Siha dara tim li ser,
Kezîzer im sisê ne,
Em her sê l’ ber Zewacê ne,
Behra xortê xelkê ne.

Kezîzerê kezîzer,
Li meha danê êvara,
Sî dageriyan zinara,
Ma’dê gewrê xeyirî,
Hemî ji xem û xeyala,
Hemî ji kul û mitala.

Kezîzerê kezîzer,
Ez xulamê memkên girover,
Wê enya te bi nîv ziyer.

Kezîzer im dido ne,
Em her du wek heyiv û ro ne,

Kezîzerê kezîzer,
Mîna berfa li zinara,
Siya dara tim li ser.

Kezîzerê kezîzer,
Kezîzerê mala min,
Agir berda dilê min,
Xweş e j’ goştê laşê min.

Kezîzerê lewendê,
Eqlê ji serê min stendê,

Sing doşek baliv zendê,
Destê xwe li destê min xe,
Emê herin govendê.

Kezîzerê dido ne,
Rîhan in endiko ne,
Kezîzerê em çar in,
Her çar in lê li mal in.

Kezîzerê em şeş in,
Û her şeş pev re dimeşin,
Xweş in jî, çavê reş in.

Kirîvê!

Nisêbînê bi qişle ye,
Hê lê kirîvê!,
Gul û rêhan tê de ye,
Meskenê min û te ye,
Kêf kêfa min û te ye.
Gundî û maliya çi ji me ye,
Ya sitar bê lome,
Çi gundê bi lom e.

Nisêbînê bi tehtik e,
Sola kirîvê bi kabik e,
Kengê mêrê kirîva min bimirê,
Kirîvê wez min bike.

Nisêbînê bi av e,
Siwar û peya da nav e,
Hewşa kirîvê min bi giha ye,
Lê lê kirîvê.

Mi çînê te badaya,
Şêx û mela lê palda ye,
Sing û berê te gewr in,
Wek xurmayê li Bexda ye.

Koçer û Dostkî

Ew kûrbîla li nav deştê ve,
Çepelê Elî Gendal û Elî Fatih li dengê rê ve,

Elî Gendal dikite Elî Fatih:
Keko! Bira ! Ne rabin li ber çepera,
Xwedê berxê nêr wê danî bo kêrê ve,
Deşta Sêcî bi qij û ber e,
Tifaqa Sîso Elî Mawîzer e,
Sed heyf û mixabin:
Sîso kuştî li ber çepera...
Deşta Sêcî bi nihêl e,
Tifaqa Sîso Elî karxana ya têl bi têl e,
Sîsoyê Elî sê denga gazî dikit,
Erê! Babo! Doskiya revî , min ne hêla,
Sed heyf û mixabin: Sîso kuştî hêj çile...

Kotiko!

Mala te bi kotiko,
Çîm xwehro, çîm qeysiko,
Lawê Hora dihniko,
Hema xwe pizik diko,
Teres siwarê dehşiko,
Navbeyna Mercê û Metîna,
Ji xwe re kiriye qevziko.

Kotik derket ser bana,
Ban kir melekê ezmana,
Rûhê kotik bistînin,
Bavên axê cebana.

Mala te bi kotiko,
Çîm xwehr û çîm qeysiko,
Tu wek jina b’ du giyana,
Li gasîna tif diko,

Ne kurk û ne çêçiko,
Ne mih û ne berxiko,
Ne bizin û ne kehriko,
Ne çêlek û goliko,
Lawê Hora dihniko,
Hema xwe repik diko.

Law Osman e

Lê yadê law Osman e,

Biçûk î tenbûrvan e,
Qedrê zeriya j' xwe nizane...

Bi vî erdî, bi vî ezmanî,
Naçim suxra vî Çaçanî,
Ka bazinê te j' miranî,
Ka xilxalê te b'xweanî...

Lê dînê, zalim dînê,
Tirsa min j' hebsa Mêrdînê,
Ziyareta Kilêbînê,
Te law bimire narim ûnê...

Osman î xerbende ye,
Te rêkirî mala me ye,
Desmala zer kir ma'ne ye,
Singê bêbavê mîna berfa li xirbe ye,
Émîşê devê te ye...

Ne dîn im, ne dirust im,
Taq rîhanê, pêlê xist im,
Teresbavo, pişta mi girtin,
li e'rdê xistin,
Du parsû yê min ne xuyane,
Sê parsû yê min şikestin...

Ez ne dîn im, ez ne har im,
Taq rîhanê pelê pan im,
Pişta mi girtin, li erdê dane,
Du parsû yê min ne xuyane...

Delîl, Delîl, Delîl, Delîl!,
Ketim bextê bavê Cemîl,
Xodo (Xwedêyo), Rebbî, kes tê nemîn,
Lê yadê law Osman e...

Lorî

Xelîlê Metînî

Lorî de lorî,
Kara min de lorî,
Berxa min de lorî....
Hekîmo, hekîmê Helebê,

Tu bîne derman û elbik û melhemê,
Birîna xortê mala bavê min pir xedar e,
Şaxê xwe berdane ser kezebê,
Lo...lo...hekîmo...! hekîmê zozana,
Tu bîne elbik û dermana,
Birîna xortê mala bavê min pir î xerab e....
Ez bala xwe didimê, zenga mirinê avêtiye dirana,
De lorî, kara min de lorî,
Dergûşa kara min ji darê lûle yê,
Ezê tê wer kim kurk û ebeyê,
Ezê berxa xwe li nav pişta xwe bişidînim,
Ezê bibim mala bavê xwe yê....
De lorî, karika min de lorî....!
Dergûşa karika min ji darê gwîzê,
Ezê pê wer kim bihna misk û mawerdê,
De lorî karika min de lorî....

Mala me ji malan wê de

Mala me ji malan û wê de,
Keçikê kulmekî li kurî da...
Kurik dibêjit:
Keçikê dînê, te gava ew kulm li min da,
Min zanî stêra min li ezmana rijiya,
û belgê min ji darê cennetê weriya,
û emrê min sed û pencî sala li dinyayê leq ma,
Mala me ji malan û wê da,
Keçikê kulmekî li kurî da,
Dibit; Kuriko dîno! Were li vî de!...

Mamo!

Mamo çû Diyarbekir,
Porê sor hine kir,
Beqala l' hev zêde kir,
T' (te) a min bû Xwedê ne kir.

Mamo ji Torê tê,
Bihna gulê jê tê,
Sebra dotmam pê tê,
Pezka kovî pê dê.

Lata reş hezaz e,
Singa gewir beyaz e,
Dosta te tolaz e,
Dêka te şambaz e.

Mam Delalê!

Çi şikefta dev mezinê,
Jê reviya refek jinê,
Çavê min li a mezinê.

Çi şikefta dev li hewa,
Jê firiya refek kewa,
Çavê min li a bedewa.

Çi şikefta dev biçûk e,
Jê firiya refek bûk e,
Çavê min li a biçûk e.

Sibe bû, min karek nekir,
Destê lêwik qipçe kir,
Sê siwara xuyayî kir.

Min go siwarino hon (hûn) kî ne?
Go xwakê em xerîbî ne,
Xwakê em rêwî ne.

Mamo!, Pismamo!

Mamo ji Torê tê,
Bihna gula jê tê,
Sebra dotmam pê tê.

Lata reş hezaz e,
Singa gewr beyaz e,
Dêka te şambaz e,
Dosta te tolaz e.

Lata reş bi rê de,
Pezka kovî tê de,
Di nav gul û bihê de,
Destê min d’ ber piştê de,
Tama cinetê tê de.

Memir

Memir, memir, memir
Mamîto lo...
Mamo ji xursê tê,
Mamîto lo...
Bihna gula jê tê,
Mamîto lo...
Memir, memir, memir,
Lo, mamo lo...
Xelkê dosta te bir,
Lo mamo lo...
Xwelî li serê te kir,
Mamîto lo...
Xwelî li qehfê te kir,
Rebeno lo...

Mero!

Dor Bêrûtê bi Zeytûn ê,
Şîrîn şerbet î lê Mero!
Tu di ber derîkî mermero,
Şîrîn şerbet î lê Mero!.
Her du diranên te zêro,
Şîrîn şerbet î lê Mero!,
Xulam qama girovero,
Şîrîn şerbet î lê Mero!.

Wê enîka bi nîv zêro,
Eman ne ma lê Mero!
Ez ban te dikim, tu î khero,
Bejin zirav î ji darê tero,
Ezê bi çeplê te bigirim,
Bibim ji canê xwe ro.

Mêremê!

Mêremê, Mêremê, Mêremê!
Şeve bi min (1) şeve, bi min şeve.
Rabe (2) cihê me (3) hilêne,
dayîna li xanebana (4) odê,
pelî gund (5) û a'lem bide heve (6).
Were ber paşilkê min rakeve,

ezê paşilkê xwe bi ser (7) te da bidim heve,
kula Helebê bikeve mala Şakir axa û Ebbas axa,
nehêştin des dibêjim mehbûbê min eve.
Mêremê, Mêremê, Mêremê!
Ji dêrê heya bi dêrê,
Ro hilatî jialiya Xêrê,
Pi (bi) ser bejna zirav xişîkî meqes û kêrê,
Mêremê virda were, tu ji kê newêrê?
Mêremê, Mêremê, Mêremê!
Li me hatî ba yê serheda (8) gulgulî,
Şewqa (9) da bû bejna zirav,
girêka (10) şehrê (11) Hamûdî Mûsilî,
Xwazî bi gav e (12) rahêjim (13) kalûnê (14) Yasimî,
Dû wê (dûyê) Kalûnê bialiyê guhada biferînim,
tu (15) miqabilî,
Ramîsana te bûne hesreta vî dilî,
Mêremê, Mêremê, Mêremê! (16)
delalê mihebbetî (17),
Li odeka mala bavê min (18) rûnişt (19) sayî sipî bû,
Jizma (20) sor (21) bû şiftalî bû,
Bi derenca hat xwar,
jizma bi nalça bû, şemotî (22),
Sayiya (23) delalê min li Qasê (24) perek lewutî,
Mêremê, Mêremê, Mêremê!
Minê sayîka delalê malê xwe jêkir (25),
Me berava Diyarbekrê (26),
li ber kelaha Heskîfê diborin,
Dilê me qêmîş nebû,
şûna axêna, me neşuşt,
me bir ava Ridwanê, av (27) pirin,
me ne şuşt, bi zugurin (28).
Mêremê, Mêremê, Mêremê!
dora Tilşahmê bi baîve,
Ez çûm (29) avê Selîve,
me nirî, me ne şuşt (30),
şûnê gamêşe.
Mêremê, Mêremê, Mêremê!
delalê malê me e´zîze,
Ez çûm (31) Stawrê (32),
dilê me qeymî ne bû,
me ne şuşt (33), şûnê palê guwîze.
Mêremê, Mêremê, Mêremê! (34)
ez çûm ava Muradê,
vaye helq (35) gotin li vê derê neşû gunaye.

Mêremê, Mêremê, Mêremê!
me got hella hella, (36)
Ez hatim (37) Mêrdînê,
Eyn -Yawoz avteze bû, megene bû (38),
Me bada, dilê me qêmîş nebû ez bişûm (39).
Mêremê, Mêremê, Mêremê!
Çiqas ez geriyam (40),
kesik me nebînê,
Me berê xwe davê Nisêbînê,
av teze tên, mi şuşt li Nisêbînê.
Hêdiya sayî welgirtiye,
avjen qismetê wî ye (41).
Mêrik Mêremê ji xwe ra biriye,
jirjî ji wê (42) hatiye,
tiştik bi dest neketiye.

Şanik: *Gotinên, ku di nav cothêvkan de, yên min in*.
Têbîniyên, *ku li binê text (têkst) hatine nivîsandinê:*
(1) bimî (2) tu rabe (3) cihka me (4) xanebanê (5) gundî (6) bi dave (7) ser (8) ba yê serheda hat li me (9) şewqa (10) grêkê (11) şarê (12) (tu ne buye) (13) rahêj me (14) qal (15) tu (16) Lê lê nemayê tu((an jî)) lê lê Mêremê ((ji vir û pêve dengbêj sêcarkirina Mêremê her gava vegeriye seriyê stranê gotiye)) (17) dilê min, dilêm (18) et me (19) rûniştiy û (20) cismika (21) sohr (22) sehliqî (23) sayîkê (24) bîs (25) me jêkir (26) re ((di stranê de ev "e" hatiye dirêjkirin, ku bi xanikên din re li saz keve)) (27)avî (28) dilê me qêmîş ne bû (29) çû me (30) me go ez ne şûm (31) ez çûme (32) stewra xopan (33) ne şuşt (34) ((li vir jî)) va ye va ye ((mîna rêzika pêşîne)) (35) helq ji me ra (36) hele bi me hele (37) ez î çû me (38)aveka teze jê tê xwar, megena bû (39) me bada (40) mêremê, hêdiya minê sayîka delalê malê xwe di navavê daniye.

Mih'emmedê Henne

Stranbêjekî filleh gotiye

Ez û Mih'emmedê Henne li hev (1) rûniştin,
Me qiset kir, me kêf hîştin (2),
Kevir û koçkê besta di h'alê me biriştin.
Mihemmedê Henne ji mal kar bû,
Li hespê boz ji xwe suwar bû,
Hespê boz li bin kehr û lal bû,
Li bajara Diyarbekrê jê peya bû,
Şehdayê Mih'emmedê Henne hebû,
Le'lîcanê Musilman bû.
Medo (3) go Mih'emmedo serê mi têşe (dêşe) nizanim çima,
Mih'emmed lê vegerand, go cîgerekê şêra jêkime,
Medo nexweş bû, li Mih'emmedê Henne zulm e,
Go hespê Mih'emmedê Henne (4) boz e,

Rêyê Diyarbekrê dikê toz e,
Emê xwe bavêjin bextê balyoz e (5),
Ew Diyarbekrê li zozanê,
Em hatin Diyarbekrê, kesik me nizanê,
Emê xwe bavêjin bextê paterkê mezin li dêrê Ze’feranê,
Kesik ev e’cêb nebînê,
Emê herin cem xoce Cabbûr, wekîlê Mêrdînê,
Mih’emmedo ev galgal ne tu galgal e,
Lingê Medo bi xilxal e,
Medo gote Mih’emmedê Henne,
Go: dînê musulmana ji xwe betale,
Go Mih’emmedo ro helatî li Masîla (Mîsilê),
Melbûsê Medo ji herîr e,
Go emê herin dînê filleh (6) dînek esîl e,
Go Mih’emmedê Henne suwar dibû li ciwaniyê,
Jê peya bû ser kehniyê,
Ez û Mih’emmedo, me kêf kirbû li bin çiyê,
Li me hatî berfê teze,
Mih’emmed li ber deriyê me hat bi lez e,
Ezê vêra herim (7) fith’ê rez e,
Rêka (8) Mêrdînê bi jebeş e (zebeş e),
Melbûsê Medo melbûsek reş e,
Hespê Mih’emmedo enî beş e,
Mih’emmedê Henne ji mal rabû,
Vê ro li ser me e’cac (9) û ba bû,
Dilê Mih’emmedê Henne li mi xirabû,
Mih’emmedê Henne suwar bû (10) li bargîle,
Peya dibû li devê bîr e,
Mihemmedê Henne bi min ne qayîl e.
E’wênya (11) şewitî va li kaş e,
Di lingê Medo qumaş e,
Ez û Mhemmedo, emê herin Mêrdînê dîwanê paşe,
E’wênya şewitî li ber bênderê,
Mihémmed destavêt qebda xençerê,
Bavê mi ji E’wênya wê bi derê,
Îro sê ro mi karek nekir,
Ro bi derket jialiyê Bohta,
Minê sozik ji xwe ra digohta (14),
Bejna Medo ket firota,
Deriyê malê me bişkêra,
Serêm (15) têşe ji kulezêra,
Mih’emmedê Henne hat, mi soz god (16) vê ra,
Ez û Mih’emmed em ketin (17) henekê,
Lê Medokê çavbelekê !,

Mih’emmed got, go bavê te qebûl nakê,
Ez herme bi tafakê,
Mih’emmedo got Medo were,
Dest bavêjim ser kember e,
Rûwê (rûyê) Medo esmer e,
Mihémmedo nabê nabê,
Dilo dilhebanî, rê lê nabê,
Kurik felle ye, musulman nabê,
Mih’emmedê Henne li Diyarbekrê kes nabînê,
Li cem qansera e’cêbeg (18) digerînê,
Mih’emmedê Henne berê xwe daye Mêrdînê,
Bejna (19) te rihane ji xwe gule (20),
Muh’bet erê ji dile,
Emê çîne Mêrdînê ser dînê filleh,
Medo mi te dî bû li şibakê,
Em ketin kêf û henekê,
Vî kêf û henekê tu ji bîra nakê,
Medo rabû dey nekir,
Deriyê odê (21) vekir,
Mihémmedo go bi der mekeve, qebûl nekir,
Mihémmedo (22) li min û li vê gohtinê,
Bejna mi (23) zirave ji tayê tutinê,
Ji te ra hêja me (24) malê dinê,
Mihémmedo hîna, bi min hîna (25),
Çavê xwe li welad (26) bigerînê,
Mih’emmedo suwar bû ser meî’nê,
Berê xwe daye bajara Mêrdînê,
Weke min kesik tu nabînê,
Medo li min, li vê gotinê (27),
Bejna te nadim bi çarçiya firotinê,
Terkê te nadim heta xrêna mirinê,
Medo (28) we ye, we ye, we ye,
Medo gotin gohtina te ye,
Heta mirinê Medo ya mi ye (29)....

.....

Di h’erbekî kin li Gera Gerdiya,
Wek şewitî li ber bênderê,
Mihemmed dest avêt qebda xencerê,
Bavê mi ji Ewên ya wê bi derê,
Îro sê ro mi karek nekir,
Çûme cem falcî mi falik vekir,
Falê mi razd bû (Rast bû), derew nekir,
Ro bi derket ji aliyê Bohta,
Minê sozik ji xwe ra digohta (digota),

Bejna Medo kedfirota,
Deriyê malê me bişkêra,
Serêm (serê min) têşe ji kulehzêra,
Mihemmedê Henne hat, mi soz god (got) vê ra.
Ez û Mihemmed, em ketin henekê

Têbînî:

(1) Lev. (2) galgal kirin, gazîn hêştin. (3) Mado. (4) ne mine boze. (5) balyose. (6) feilleha. (7) Bi Mhemmedê Henne fithê reze. (8) riya. (9) toz û ecac. (10) dibû. (11) Ewêniya. (12) Ez çûme. (13) rast bû. (14) digota. (15) Serê min. (16) got. (17) ketne. (18) ecêbek. (19) Medo bejna te. (20) Û ji xwe gule. (21) Kir ku vekir . (22) Medo. (23) Bejna te. (24) Bejna mi hêjayê. (25) Îna. (26) welat. (27) Gohtinê. (28) Go. (29) Te ye.

Mîrê Kurda (1)

Milhim beg, Xudanê çiyayê Şengalê

Dilê min î li hane,
Sûrega çiyayê Şengalê, çel û çar hezar malên Yezîdiyane,
Milhim beg li ser wan mîr û sultane,
Milhim begê, di ser re çû wext û zemane,
Berê paşê de dibêjin: Hene başboxazê meriyane,
Vana kirin devê e'wîl û maqûl, kal û pîrane,
Vana li hemû dera geriyane,
Werin nerindiyekê têxin nava çel û çar hezar malên Yezîdiyane,
Go: balê xwe bidinê ! aliyekî eşîrê ketine kêfê û zewqê,
Li pêşê mala colêd miya ketine u'rurê û kalkalê,
qenteriyêd deviya û naxirêd gane...
Aliyê e'şîrê yê din, halê dinê li wane, xezane,
Aliyekî din dev dane çiya û zinarane,
Dibên em qebûl nakin h'ukmê Milhim begê,
Ma çima aliyekî ketiye kêfê û aliyekî xêzane?
Bala xwe bide, çawa berê daran peqiyane,
Qirikê deştan di gul û çiçekan de xemiliyane,
Li nava malan û navê gundiyane,
Nabê gumirtiya devê meşkane, borborê zarokane...
Wana bi hesret qeymax û mastê hilbana,
Vana serê hevdu hezandin,
Çend meriyêd di ser re bilyane,
Go: Emê herin bin konê Milhim begê,
va şorê jê re bikin xweyane,
Heger ku nikane bike xizmetê çel û çar malên Şengalane,
bila ji ser milê xwe deyne kurg û hewrane...
Dema ku ji Milhim begê re gotin,
Çav li serî bûn gulê topê,

Tamarên serî rabûn, bostekê û çar tiliyane...
Got:" *Hûn berdin şorên fesad û qumsiyane,*
Nekin ji guhên xwe (.....),
Di nava malên xwe de em nekin dee'wa û dogişên girane,
Hîro ((îro)) ez ji we re dikim beyane,
çel û çar hezar mal me hene,
Em sal bi sal dikin vêrg û salane,
Ewê ku bi dest de tuneye,
Cara min rokê nedaye bin ço û lêdane,
û mala wî ji xwe re ne kiriye xez û talane,
Ê ku xebat û kar dike halê xwe xweşin,
nahese bi sae't û soliqane,
Wanê ((ewên)) bêkar, piştên xwe ber hewş û dîwarane,
Nehatine rokê li deriyê min nedane,
Negotine bo zarowên me nîne nan û arvane ."

Milhim begê ji wan re şorkirin,
Yekî got: Şora begê doxriye,
Yekî got: Dunya derewane...
Dengê van di nava çel û çar hezar mal de rabû,
Kete guhane, gihaşt gelek derane,
Pir dirêj kir, ket h'ukmê çar salane
Ji Milhim begê standin kurg û hewrane...
U'mer û bi E'vdê û bi Kehrê ve,
Dibên Kehr î bilyane û Kehr î pişthesp î pehlewane,
Lê pir şoran û gaziyan dikin,
Kehr tênagihîne şorên wane,
Çiqas bibe, ewî ji malêd zengîn û xanedane,
Her wextekê nabe sêfîl û xezane.

Milhim begê serê xwe da axa gorane,
U'mer û E'vd û Kehrî ketin berdestê pîrê,
Li çiyayê Şengalê nakin xizmeta wane, li wan dikin zorane...

Dayîka wana, Xanima gelek cariya,
Ji bil etbaî' û xizmetkaran, xelk dide meda û toxirmane...
Pir pê zehmet hat, çetin û girane,
Royê heft caran mirina xwe dixwaze,
Dibê ez jî herim axa gorane,
Dibê bila çavên min nebînin,
Dibin hatin kirin serê E'vdê û U'mer, serî şikiyane,
Kinc ji pêsîr û bedenê diriyane,
Ca destê min naqetê ji hersê lawane, bi min girane,
Dûre bi demane, nêzîke bi şorane....

Dayîka wan serê xwe da gora tarî,
Kurên Milhim begê li Çiyayê Şengalê, sêwî û berder mane,
Çiqas medam û şoran û toxirman didin Kehrî,
kehr guh nade wane...
Salê Evdalê dikevin çardehane,
Çiyayê Şengalê tev ji Evdê acizin,
roj bi roj lêxistina zarokane,
Kes na hewîne, li ser digrin deriyane,
Guvînta bayê Almamedê ji meha zemherîrê,
bi ser Evdê tê berf û barane,
Rêk û dirb li pêşa Evdê nemane,
Evdê Milhimê begê derdikeve nava malane,
Bervê xwe da çiyayê bi dûmane,
Dikeve şikeft û berqefane, dunya reşe, qurî zîndane,
Borbora gur û hevtar, cinawerên çolane, xew naye çavane,
Kutkuta dilê Evdê di zikê wî de,
Xeşîme, rê û yolaqa nizane,
Rohilat, dûman hilkişî serî çiyane,
Rêk û dirb ji wî ve hatin xweyane,
Ji nava malan derdikevin şivan û gavanane,
Evdê got:
" *Min di sî û sê gornê bavê van niyo,*
Evan ketine nav nivîn û ciyane,
Dane wan agirê Pixarane,
Ji hêvara mirina mîrê mezin da,
Evd ketiye bin şikevtane,
ne av û ne nane..."
Dema li Evdê nêzîk bûn şivan û gavanane,
Evdê rakir hîmekî zinarane,
Got: " *Tûr û nanê xwe deynin dera hane*."
Nanê germ, mûjê çiyayê Şengalê di nav da ne,
Evdê nanê xwe xwar,
"*Hele ez herim serê van sirtên hane*, "
Evdê vedixwar ava curnane,
Rojekê dudiya, dixwar çayîra çiyayê Şengalê,
dunya derewvane...
Got: " *Evan xêrê bi min nakin,*
ditirsim ewan rojekê min biînin axa gorane."
Ji Evdê ve xweya tê berîka bê pîvane
Evdê roya lêdixe li şevane,
Şevan lêdixe li rojane,
Rokê bala xwe didiyê, ba rabûye, toz û kulxane,
Evdê nêzîk dike, dibîne,

di wir de dihere karwan û bazirgane,
Hal û teqeta Evdê nemane,
ne av û ne nane,
lêvên wî ziwane,
destên xwe dane ser navane,
bi roya û heftane,
derketiye nava çolane...
Wana rabûn qelazê avê dane Evdê,
pêş evdê nan deynane,
Gotin: " *Kuro ! tu kuve derê?*
ji kuve tê?
ma tu şivane?
torinên te wendane?
an jî malan barkirî,
tu mayî li şûn wan e?."
Go: "*Apo! xalo! di bextê we da me,*
min ne dê û ne bave,
ez mame li ber hewş û dîwarane,
Ji min re bikin beyane,
ma hûn kuve diherin ?..."
Gotin:" *Em diherin e'bra Milane*."
Evdê go: " *Ez di bextê we da me,*
ez nizanim rê û dirbane."
karwanan bi xwe muh'tacî meriyane,
Ewan siwarin, çoyek kirin destane,
Gotin Evdê: " *Ji me re bajo qatirane*."
Bi dema nêzîke, kine bi şorane...
Evd digihîne ebra Milane,
Vana ajotin, çûn mala Iskan paşayê Milane,
Karwanan barên xwe deynane,
û ketin şorane,
Wana ji mêvanan re çêkirin xwarin û nane,
Iskan paşayê Mila xeber da yekî û duwane,
Tiştê wan jê re firot muşteriyane,
Yekî ji karwanan got:
"*Emê yadîgariyekê bidin te, beg her mih'tacê lawane,*
Tu dikarî bavêjî nav xulam û etbaa'ne,
Yan ji xwe re bikî şivane,
Salên Evdê li çardehane,
Hêpek û simbêl badane..."
Go: " *Bawer dikim ev kurê we ye,*
Hûn bi min dikin henekane."
Gotin : " *Sêwiye, ne dê ye û ne bave,*
qetiye ji xudiyane."

Go: " *Berê li deriyê min hene heştî, nod şivane,*
Ma em sêla xwe bo zarokekî kuç dikin ?
Bila here bike xizmetê mêvanane,
Ji me re çêke qehweke tîr û girane."

Evd kurê Milhim begê ketiye deriyê Iskan paşayê Milane,
Mîna xizmetkar û kolane,
Lê ji xeyd û bîra Evdê tê şevên reş û barane,
Evd ji xwe re dibê:
" *Eger bidin min nivînekê û kulavekî hêtirane,*
çêtire ji çol û beriya vê pîvane."
Wextê e'gîd û mêr tên bin konê paê Milane,
Bal û baweriya Evdê tim li ser şûrane,
Yek dibîne, ku guhên Evdê ne li ser fermanane,
Meraqa wî ne xwarin û nane,
Ji berê de hebûn adetên erfat û îdane,
Li meydanekê çêkirin agirê sîngsîngê,
Li ber rabûn hev mîna pehlewanane....

(Mixabin ! E'liyê Heyder ev strana ji me re nebir serî...)
(1) Sala 1987'ê min ev parçe ji devzara E'liyê H'eyder girtiye, Elî H'eyder ji dev bavê xwe Mislimê E'lo bihîstiye, Mislimê E'lo jî xelkê Çiyayê Kurda ye (rojavayê Kurdistanê).

Mîro!

(Hey lo Mîro!)

Hey lo Mîro, hey lo Mîro!
Te serxweşo, îmdad û meded gelek dûro....
Fîncan giro, qehwe tîro....
Yadê rebenê...şevê çûnê, çi qewimî û çi ciriya,
Li mala Ilyasê Hemzo, civateke mezin digeriya,
Şêwr û mişêwirê giran li mala Ilyasê Hemzo didaniya,
Sae't şeşê rojê min xiyal û bala xwe dayê,
Di nav bira Tehta Sor û Tehta Girmo de,
Sê kemînê giran li pêşiya Mîrê min danîne,
û rûniştine bi sê ciyan...
Mi dî xweş tê dengê çapliyan, qîştînê fedawiyan....
Sae't şeşê rojê û pê ve, mi dî êrîş bûne,
Ser cendekê Mîrê min bi darê çapliyan....

Mûsa Xaîn

Merev, merev !

Mûsa mere...
Te hetka min derxistî, bi navê xwe re,
Bi çeplê Stiya Namo bigir, bibe j'xwe re,
Heta bi erdê Şamê, ez bi te re,
û sozê min bi qerarê te re,
Heçî li dû sozê xwe vegere,
bê dîn bimire li ser riya bêdîna here...
Mûsa xaîn, bextê dinyayê ne wilo ye,
ne bi zirta ye, û ne bi forta ye,
Ne bi çefiya e'gêl xwarkirina ser xaniya ye,
Do (diho) pêr, mi tu diye ji ber Hisênkî gurî, tu reviyayî,
Li ber çavê min weke mijê tifingê tu xuyayî,
tu sekinî li diyarê heftayî,
Mûsa me re, bext ne wiha ye....
Konê Mûsa xaînê xwe bûm,
Sala vê salê, ez canê, min kirin nîşana gulleyê zer e,
Porê minî sor û sosinê li tûmka digere,
Mûsa, konê Mûsê min li ber avê,
Te rextê çarperçe, bavê devziravê,
Heya li me derkevin gaziya mala bavê....
Mûsa wayê, bext ne wihayê,
Te dest ji Stiya Namo berdidayê,
Te hişt li çol û çiyayê....

M' xwena te dî

Her lê lê, de lê lê lê,
Her nedî, nedî, nedî,
Şevê çûyî m' xewna te dî,
Mi destê xwe l' ser memkê te dî,
Mi devê xwe l' ser rûkê te dî.
Xwezla gewrê a min biwa,
Bila biçme ji vî beledî,
Bila ez nemirim ebedî,
Kesek têmtêla te nedî,
Li ber te bûm kewka kedî.
Mi dî bû li berwarê,
Xwedê mêrê te nehêlê,
Mêrê te pîs e, lê lê lê,
Mîna mişkê d' bin kewarê.
Mîna çarûxê gemarê,
Mîna zembîla xesarê,
Xwedê mêrê te nehêlê,

Mîna qeraşê l’ ber sêlê,
Ezê bi çeplê te bigrim,
Bavêm welatê jêrê.
Mi dî bû l’ ser qubê,
Te dî bû l’ ser qubê,
Bejin ziravê, ser bi ribê,
Her lê lê, de lê lê lê.
Mi dî bû li ser avzêlê,
Te dî bû l’ ser avzêlê,
Li te esmerê, kofîkêlê,
Ezê bi çeplê te bigrim,
Bavêm welatê jêrê,
Tama memkên te xweş in,
Wek şekirê bajêrê.
Mi dî bû li ser bênderê,
Esmerê, xizêm zerê,
Keça sa, qîza kerê,
Şêrînê mihteberê,
Ezê rabim te b’ revînim,
B’ kotekê, b’ darê xençerê,
D’ ser qehrê mêrê te re.
Binya mala bi qaş e (kaş e),
Daw û derlingê te qimaş e,
Kûçikê mêrê te ne baş e,
Wek keraşê li ber aş e.